Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1392 8-Tîrmeh-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Wateya sembolîk a cilûbergên Kurdî

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Cilûbergên Kurdî ne tenê cilûbergeke kevneşopî ne, lê nasname û sembola gelê Kurd temsîl dikin. Rengên wan yên geş û neqşên cihêreng, çîrokên dîrok û mîrateyê nîşan didin û ji nifşekî ber bi nifşekî din ve têne veguhastin.**



Cilûbergên Kurdî li gorî şert û mercên erdnîgarî û avhewayî yên herêmê hatine çêkirin. Cilûbergên Kurdî yek ji sembolên çandî yên herî berbiçav ên Kurdan e, bi hûrgulî û rengên xwe ji herêmekê bo herêmekê din diguherin, di heman demê de taybetmendiyên xwe yên bingehîn ên ku girêdana wê ya kûr ku bi jîngeh û dîrokê re nîşan didin, diparêzin. Cilên jinan bi cilên dirêj û xemilandî yên wekî kras û xiftan têne nasîn, ku pir caran bi rengên geş û bi têlên biriqok hatine xemilandin û bi cil û bergên binî yên biriqok ên bi navê deling re têne diyarkirin. Cilên mêran bi gelemperî ji şalwarên fireh ên bi navê şapik, jaketek kevneşopî û kemberek qumaşî ya bi navê çutik ku li dora newqê tê girêdan pêk tên, herwiha li ser seî kum an kuluz heye.

### Kokên dîrokî yên kûr

Cilûbergên Kurdî vedigerin demên kevnar. Lêkolînên dîrokî nîşan didin ku Kurdan ji şaristaniyên ku li çiyayên Kurdistanê dijiyan ve cilên cihêreng li xwe kirine. Ev cilûberg ji aliyê erdê çiyayî yê herêmê ve bandor bûye, bi cilên ku ji bo rehet, pratîk û li gorî şert û mercên avhewayê yên cûda, ji zivistanên sar bigire heya havînên germ hatine çêkirin. Bi dirêjahiya serdeman, cilên Kurdî gelek pêşketin derbas kirine, lê dîsa jî hêmanên xwe yên bingehîn ên ku wê ji cilên kevneşopî yên gelên din ên li Rojhilata Navîn cuda dikin, parastiye. Cilûbergên Kurdî yek ji sembolên çandî û mîratî yên herî girîng e ku nasname û dîroka dewlemend a gelê Kurd nîşan dide. Ew ne tenê cilên kevneşopî ne ku di demên taybet de tên lixwekirin, lê belê beşek yekgirtî ya çanda Kurdî ne, hûrguliyên wê girîngiya civakî, dîrokî û estetîkî hildigirin ku bi sedsalan dom kiriye. Tevî guhertinên siyasî û civakî yên ku li herêmê belav bûne, Kurdan ev cil parastine û ew kirine şahidiyek ji bo reseniya wan û pabendbûna wan bi mîrateya xwe re.

Cilên mêrên Kurd bi gelemperî ji şalwarên fireh û yelek an jî jakêtên dirêj pêk tên û kemberek fireh li dora newqê tê lixwekirin. Mêr her wiha li ser serê xwe wekî cemana an kefiyeya Kurdî li xwe dikin, ku pir caran ji qumaşên bi nexşên bi rengên cûrbecûr tê çêkirin. Cilên mêran bi xweşikbûn û sadehiya xwe têne nasîn û reng û şiklên wan ji herêmekê bo herêmekê diguherin. Cilên jinên Kurd bi bedewiya xwe, rengên geş û nakişên xwe têne naskirin. Ew bi gelemperî ji cil û bergên dirêj û xemilandî yên ji qumaşên hevrîşim an qedîfe pêk tên, ku bi zêrên kevneşopî û aksesûarên wekî kemerên zêr, gerden û destbendan xemilandî ne. Jinên Kurd pir caran rengên geş ên wekî sor, kesk, şîn û zêr li xwe dikin, rengên ku sembola şahî, jiyan û xwezayê ne. Ew her wiha serê xwe bi morîk an pereyên antîk xemilandî li xwe dikin, ku destanek bêhempa û kevneşopî li cilên xwe zêde dikin.

### Sembolîzma rengan

Girîngiya cilûbergên Kurdî ne tenê di balkêşiya wê ya estetîkî de ye, lê di heman demê de di wateyên sembolîk ên kûr ên reng û neqşên wê de jî ye. Kesk sembola xwezayê û berhemdariyê ye, sor hêz û wêrekî temsîl dike û zer jî ronahiyê temsîl dike. Wekî din, hin naqişe girêdanên erdnîgarî an eşîrî nîşan didin. Di hin rewşan de, herêma eslê kesekî dikare bi celebê xemilandinê an şêwaza dirûtinê ya ku di cilên wan de tê bikar anîn were nas kirin.

Cilûbergên Kurdî hîn jî taybetmendiyek berbiçav a jiyana civakî ya Kurdan e, nemaze di dema pîrozbahiyên neteweyî, dawetan û cejnên din ên gelêrî de. Newroz, Sersala Kurdan yek ji girîngtirîn bûyerên e, ku tê de mêr, jin û zarok cilên kevneşopî li xwe dikin wekî îfadeyek serbilindiya xwe bi nasnameya xwe ya çandî û mîrata xwe ya neteweyî. Di dawetên Kurdan de, cilên kevneşopî beşek girîng a pîrozbahiyê ne, ku jin xwe bi cilên xweşik ên nakişkirî dixemilînin, lê mêr cilên xwe yên kevneşopî li xwe dikin, dîmenek diafirînin ku yekîtiya civaka Kurd û pabendbûna wê bi adet û kevneşopiyên wê nîşan dide.

Tevî belavbûna modên nûjen û bandora wan li ser şêwazên cil û bergan di civakên cûrbecûr de, cilûbergên Kurdî hîn jî cihê xwe yê taybet diparêzin. Di salên dawî de, pêşangeh û festîvalên ku ji bo pêşandana cilên kevneşopî yên Kurdî hatine çêkirin, bi armanca ku nifşên nû bi girîngiya vê mîrateya çandî bidin nasîn û wê ji windabûnê biparêzin.

## Bi kamîreya Ayşa Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

### LI SER BAZIRGANIYÊ

**Dewbir firot:**
- Tev firot; yek tenê jî nehişt; şîr, mast û dew li ser xwe birîn.

**Di zik hev de:**
- Yê baş û xirab, yan jş piçûk û mezin bi hemen bihayî.

**Ez zindiyan nadim bi cindiyan:**
- Ez tiştên baş nadim bi tiştên nebaş.
(Li vir cindî ji bo miriyan tê gotin)

**Ji destên hev digirin:**
- Pir tên firotin.

**Ji destê xwe derxist:**
- Firot.

**Ji destê xwe deranî:**
- Bi heman wateyê.

**Li pişt ket firot:**
- Tev firotin; tiştek bi şûn ve nehişt.

**Malê min ev e:**
- Dixwazî bikire dixwazî nekire.
Ma masî di avê de tên kirîn?
- Ma nedîtî bazara tiştekî tê kirin?

**Weke avê diçin:**
- Bikirên wan pir in; xweş tên firotin.

### LI SER HEYFHILANÎNÊ

**Di devê wî re anî:**
- Heyfa xwe jê stand; nehişt jê re bimîne; pirsgirêkên mezin jê re çêkirin.

**Di firnikê wî re anî:**
- Bi heman wateyê.

**Di dev û kepiyê wî re anî:**
- Bi heman wateyê.

**Di devê wî re deranî:**
- Bi heman wateyê.

**Eyba xwe şûşt:**
- Heyfa xwe hilanî.

**Xwîna wî li erdê nema:**
- Heyfa wî hat standin.

### LI SER YEKÎTÎ Û TIFAQÊ

**Gotina xwe kirin gepçiyekî:**
- Gotina xwe kirin yek.

**Her teyr bi refa xwe re difire:**
- Her kes di nava mirovên xwe de, gelê xwe de qîmetê wî heye; kesê ne bi mirovên xwe re be, ne bi gelê xwe re be wê zererê bibîne.

**Lingê min bi lingê te re:**
- Xêr be şer be ez bi te re me.

**Milê wan di hev de ye:**
- Bi hev re ne; navbera wan pir xweş e.

**Mil bi mil:**
- Tev bi hev re; bi yekîtiyeke xurt

**Werîsên xwe bi ser hev ve dikin:**
- Ya xwe dikin yek; di navbera xwe de yekîtiyê çêdikin; li hev dikin; bi hev re planan çêdikin.

**Yek dest in:**
- Biryara wan yek e.

**Yê ji me be wê li ber tifika me be:**
- Eger ji me hes dike, eger nêzîkî me ye divê li cem me be.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Rêber Apo gavên pêvajoyê destnîşan kiriye, lê Tirkiyê wan gavan navêje’



Parêzer û çalakvanê hiqûqî, Mihemed El-Neîmî diyar kir ku Rêber Apo hemû gavên pêwîst ji bo serkeftina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk destnîşan kiriye, lê heta niha Tirkiyê gavên hiqûqî yên pêwîst neavêtiye û ev yek pêvajoyê dixe metirsiyê.**R-4**

## ‘Jinên Kurd karîbûn zimanê xwe mayînde bihêlin û biparêzin’




Endama Saziya Zimanê Kurdî (SZK) Delal El-Haşimî da xuyakirin ku jinên Kurd roleke mezin di mayîndekirin û parastina zimanê Kurdî de lîstin û wiha got: “Jin bi hest û fikir Kurdayetiya xwe diparêzin."**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1392 8-Tîrmeh-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# DESTHILATDARÎ ABORIYA XWE XURT DIKE Û GEL BIRÇÎ DIHÊLE


Hikumeta demkî ya Sûriyê li ser terzê rêjîma Baas, îro bi rêya peymanên gaz û petrolê hebûna xwe ya siyasî xurt dike û gelên Sûriyê birçî dihêle. Hêzên cîhanî û herêmî kompanyayên xwe li Sûriyê kirine dewrê, pirs ew e gelo wê ev projeyên aborî bikevin xizmeta gel an hêzên hegemon û desthilatdariya Sûriyê? Lê rastiya li ber çavan; Desthilatdariya Sûriyê bi xurtkirina aboriya xwe mijûl e û gel jî ji ber hejariyê diqîre.**R-6**





## Zihniyeta nijadperest gefa li ser civaka pirçandî ye

Civaka pirçandî modelekî civakî ye ku tê de komên xwedî ol, ziman, netew, çand, bîr û baweriyên cuda di nav heman sîstema siyasî û hiqûqî de bi hev re jiyan dikin, lê bi serdema kapîtalîzim û pêşketina zihniyeta nijadperestiyê re, gefên li ser vê modelê zêde dibin.**R-7**



## Zindawerên çand û hunera Kurdî

Hunermenda Kurd Gulbuhar (Fatima Elî); Dengê bîranîna Kurdî û parêzvana awaza Kurdî ya resen bû, ew ne tenê hunermendek an stranbêjek bû, lê dibistanek hunerî ya yekgirtî ya afirîner û nûjeniyê bû.**R-9**

**Tacîza zayendî pergala civakan dinûximîne**
Rênas Efrîn R-7

## Ji merasîma çekşewitandinê heta niha çi gav hatin avêtin?




Pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” ku bi banga Rêber Apo dest pê kir, piştî merasîma çekşewitandinê ya dîrokî, bi gavên siyasî yên nû berdewam kir. Ji avakirina komîsyonê heta vekişandina hêzên Tevgera Azadiyê ji sînorên Bakur û nîqaşên li ser qanûna çarçoveyî, gelek pêşketin çêbûn. Ji merasîma çekşewitandinê heta niha çi gav hatine avêtin? **R-5**

# 'Jinên Kurd karîbûn zimanê xwe mayînde bihêlin û biparêzin'

Endama Saziya Zimanê Kurdî (SZK) Delal El-Haşimî da xuyakirin ku jinên Kurd roleke mezin di mayîndekirin û parastina zimanê Kurdî de lîstin û wiha got: "Jin bi hest û fikir Kurdayetiya xwe diparêzin."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**





Bi hezarê salane siyaseta asîmlasyon û qirkirinê li ser gelê Kurd tê meşandin, bi her awayî dixwazin ku hebûna Kurdan tune bikin û bi taybet li Rojavayê Kurdistanê di serdema rêjîma baas de, di salên 1960'î de bi sazkirina Kembera Erebî re hewildan ku dîroka Kurdan veşêrin. Lê jin û dayîkên Kurdan karîbûn ku zimanê Kurdî biparêzin û derbasî nifşan dîtir bikin, di heman demê de bi israr û îradeya xwe ya xort careke din zimanê Kurdî mayinde hişt.

Di vê çarçoveyê Endama Saziya Zimanê Kurdî (SZK) Delal El Haşimî ji Rojnameya me re axivî.

**'Gelê Kurd li Sûriyê nikarîbûn bi zimanê xwe biaxivin'**

Delal El Haşimî diyar kir ku di dema Rêjîma Baas de xwendin bi zimanê Kurdî xewnek bû û wiha got: "Di serdema rêjîma baas de rewşa me weke gelê Kurd gelek xerab bû, bi taybet di milê ziman de. Gelê Kurd di Sûriyê de weke netewekê dîtir nikarîbû li dibistan û cihên fermî bi zimanê Kurdî biaxivin. Di wê demê de xwendekar û zarok bi tirsekî û derûniyeke xerab derbasî dibistanê dibûn, me wê demê digot gelo em ê çawa biçin dibistanê ango çawa em ê bi memosteyeke Ereb re biaxivin û em bi zimanê Erebî nizanin. Ev jî ji bo me weke zarok û gelê Kurd gelek bi êş bû, bi awayekî mecbûrî me bi zimanê Erebî dixwand ji ber ku ji bilî zimanê erebî zimanêdin di hundir Sûriyê de qedexe bû."

**'Bi sazkirina Kembera Erebî re hewildan ku dîroka Kurdan veşêrin'**

Delal El Haşimî destnîşan kir ku erebkirina gund û bajarên Kurdan bi zanebûn bû û wiha pê de çû: "Em di bin alek, zimanek, netewek û dîrokekê de mezin bûn, her tim hewaldidan ku dîroka me veşêrin, em bi vê eşê re mezin bûn, heya niha dema ku ez qala van bûyeran dikim ez diêşim û hestên wê demê tên bîra min. Di serdema rêjîma baas de dema ku me qonaxa xwendinê ya navîn dixwand, bi taybet xwendekarên Kurdên li Rojavayê Kurdistanê binav dikirin nabe ku hûn ji bilî zimanê Erebî bi tu zimanên din biaxivin û bi taybet li bajarê Qamişlo ev yek dihat dîtin.

Pirbûna pêkhateyê Ereb li Rojavayê Kurdistanê piştî sazkirina Kembera Erebî ji Dêrik heya Helebê bû, projeyeke siyasî û demografî bû ku ji aliyê rêjîma baas ve biryara wê di 1962'an de hate standin û di salên 1974'ê de li Rojavayê Kurdistanê hate cîbicîkirin. Bi sazkirina Kembera Erebî re hewildan ku dîroka Kurdan veşêrin. Erebê mexmûrî ji ber piraniya erd û gundên wan li ber ava Firatê çûne, ji bo vê jî bi vê navê tên naskirin, bi hezarên gundan ji wan re avakirin û û li herêmên Kurdan bicihkirin. Ew sîsteme Erebkirina bajarên Kurdan bi zanebûn hate kirin. Armanca vê projeyê guhertina pêkhateya herêmê û erebkirina sînorê navbera Sûriye û Tirkiyeyê de bû."

**'Dayîkên Kurd karîbûn ku zimanê Kurdî mayînde bihêlin û biparêzin'**

Delal El Haşimî daxuyakirin ku dayîkên Kurd ziman û hebûna xwe parastin û wiha anî ziman: "Bi her awayî xwastin ku zimanê Kurdî tunebikin, lê belê dayîkên Kurd roleke mezin di mayîndekirin û parastina zimanê Kurdî de lîstin, ji ber ku dayîkên me di destpêkê de ji bilî zimanê Kurdî bi tu zimanên din nizanîn, di heman demê ew sîsteme ku di dibistanan de li ser Kurdan dihat meşandin di malê de nedihat bikaranîn, ev jî sedema herî sereke ya parastina zimanê Kurdî bû, ji ber vê yekê jî em weke Kurd dibêjin zimanê dayîkê ku dapîr û dayîkên me bi zimanê me yê resen diaxivîn û heta roja me ya îro bi vî rengî ye. Herwiha zimanê Kurdî bi rêya stran, çîrok, destan, çand û hunerê karîbû xwe mayînde bike."



**'Bi Şoreşa Rojava re zimanê Kurdî hîn dewlemendtir bû'**

Delal El Haşimî tekez kir ku bi Şoreşa Rojava re zimanê Kurdî xwe di nava herêmê de fermî kir û wiha domand: "Kevirê bingehîn ji zimanê Kurdî re bi destpêka Şoreşa Rojava re hîmê xwe ya bingehîn danî ser. Bi Şoreşa Rojava re zimanê Kurdî hîn dewlemendtir bû. Di vê derê de jin roleke herî girîng lîst ku îro roj bi vê kedê zimanê dayîkê gihaştiye vê qonaxa ku em tê de ne. Bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re bi awayekî fermî dibistanên bi zimanê Kurdî ku di nava xwe de hemû pêkhate û zimana digire li tevahî herêmên Rojavayê Kurdistanê vebûm, bi hezaran xwendekarên Kurd harîbûn ku bi zimanê xwe ya resen bixînin û bibin xwedî bawernameyên Kurdî. Di heman demê de li kêlekî wê jî bi hezaram memoste hatin perwerdekirin, akademî, biraş û astên bi zimanê Kurdî ji wan re hatin vekirin, derfeta xwe pêşxistinê û fêrkirina bi zimanê Kurdî bi me re çêbû.

Herwiha em ji bîrnekin ku Şoreşa Rojava bi şoreşa jinê hate naskirin jinê di hundir vê şoreş de şoreşe din avakir. Bi ked û israra jinê zimanê Kurdî belav bû û hate parastin. Di qonaxê salên 2012-2013-2014'an de hejmarên herî mezin di fêrkirina zimanê Kurdî de bê berdêl jin bûn. Di vê demê de me bi kafxaşiye mezin xebat dikir, bi şev û roj xebatê me berdewm bû û qet em nediwestiyan. Derfeteke ku em karibin bi zimanê Kurdî bixwînin û bidin ji bo me serfirazî û mûcîze bû, ji bo vê jî me bi her awayî hewaldida ku zimanê Kurdî bi pêş bixînin."

**'Jin bi hest û fikirê  Kurdiya xwe diparêze'**

Delal El Haşimî da zanîn ku jinê di nava xebata perwerdê de ciheke mezin girt û wiha got: "Jinê di warê perwerdehê de bi hemû temenê xwe fêrî zimanê Kurdî dibûn di heman demê de me aste dibirin û li kêlekî wê jî li dibistana waneyên Kurdî didan xwendekaran. Ev destkeftî bi ked û berxwedaniyeke mezin hate domandin, di hamû kar û xebatan de jinê cihê digirt. Jinê ne tenê xwendekar fêrkirin ango nifş avakirin, lê belê tevahî civak fêrkir. Tê gotin ku jinê nivê civak ye, lê belê jin civak bi giştî ye, eger bi rêje be jin navê civakê ye, lê belê nivê din jî bi dest jinê tê perwerde kirin.

Jin bi hest û fikir ziman û netewa xwe ya Kurdî diparêze, di mal, dibistan, kolan û li her derê jin zarokan hînî hezkirina netew û zimanê dayîkê dikin. Bi axaftin û gotinên xwe yê bi zarokan zimanê Kurdî parast û derbasî nifşên dîtir kir. Jinê di qada civak, perwerde, leşkerî, siyasî û hwd de xwe isbat kir ku eger jin li ku derê be dikare wê hebûna û nasnameyê biparêze."

**'Divê zimanê Kurdî bi awayekî fermî di destûra Sûriyê de were bicihkirin'**

Endama Saziya Zimanê Kurdî (SZK) Delal El Haşimî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di 8'ê Kanûna 2024'an de rêjîma baas hate ruxadin, piştî wê hikumeten nû a bi navê hikumeta demkî a Sûriyê hate ser serweriya Sûriyê, bi hatina vê hikumetê re destûreke nû ji bo Sûriyê hate nivîsandin ku hate diyarkirin xwandina bi zimanê Kurdî tenê 2 seatin bin, lê em weke memoste û gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê qet vê biryarê qebûlnakin. Di destpêka Şoreşa Rojava de zarokên Kurd bi zimanê Kurdê dixwînin û gihaştine aste zanîngehê di heman demê de bi bawernameya xwe ya Kurdî derçûne, çênebe mafê van xwendekaran di Sûriyê de were xwarin ango pêşeroja wan hilweşe, ji ber vê yekê divê zimanê Kurdî bi awayekî fermî di destûra Sûriyê de were parastin û misogerkirin.



# Qurbaniyên erdheja Venezuelayê gihaşt nêzî 3 hezaran

Hejmara qurbaniyên erdheja wêranker a ku li Venezuelayê di 24'ê Hezêranê de rû da, gihaştiye 2 hezar û 954 kesan. Li herêmên erdhejê hîna xebatên lêgerîn û rizgarkirinê ji bo kesên di bin kavilan de mane, berdewam dikin.

**Navenda Nûçeyan**

Di 24'ê Hezêranê de li Venezuelayê du erdhejên wêranker li pey hev çêbûn, navenda erdhejê jî li wîlayeta Yarakoyê bû herihwa pileya wan gihaşt 7,5 û 7,2 di encamê de erdhejên mezin çêbû û hemû nişgtecihê herêmê hîs kirin.

Di heman demê de Wezareta Raghandin û Agahdariyê eşkere kir ku hejmara birîbndaran gihaştiye 16 hezar û 592 kesan, lê 16 hezar û 309 kesan malên hatin hilwişandin ji ber erdhejên li pey hev. Ev erdhej yek ji karesatên xwezayî yên herî kujer ên ku welat di dehsalên dawî de dîtiye, pêk hat.

**Erdhej bû sedem ku bi hezaran malbat bê mal bimînin**

Wezaretê zelal kir ku 190 avahî bi temamî hatine hilwişandin herwiha 856 avah bi giranî xisar dîtine, ev yek bû sedem ku bi hezaran malbat bê mal bimînin herwiha zêdebûna pêwistiyên mirovî li herêmên bandordar.

Rayedaran destnîşan kir ku tîmên lêgerînê û rizgarkirnê karîbû 6 hezar û 462 kesan ji bin kavilan rizgar bikr, herwiha 22 hezar û 445 kesan lênerîna bijîşkî li nexweşxane û navendên tenduristiyê, dîtine.

Wezartê zêde kir ku alîkariya mirovî gihaşt 86 hezar û 794 malbatan, di nava alîkariyan de 9 hezar û 486 ton ji madeyên xwarinê hebû, ligel dabînkirina pêwistiyên sereke ji bo kesên ku bandor bûne, di çarçoveya berdewamiya operasyonên rakirina kavilan û nirxandina xisaretê.

Rayedarên Venezuelayê hewldanên xwe ji bo dîtina windayan û vegerandina xizmetguzariyên bingehîn ji bo deverên ku bandor bûne didomînin, di nava metirsiya berdewamiya bandorên mirovî û aborî ji ber mezinahiya wêraniya ku ji ber karesatê çêbûye.

**Operasyon berdewam in**



Li gorî ajansa AFP, tîmên rizgarkirinê heya niha operasyonên wan berdewam dikin, herwiha hîn jî cenazeyan ji bin kavilan derdixin. Xizmên kesên ku di bin kavilan de asê mane, di operasyonên rizgarkirinê de alavên giran, weke alavên kolandinê û buldozer bikar anîn.

Susana Graterol, ku 10 cîranên wê hîn jî winda ne, got, "Divê em malbat vê rûpelê ji holê rakin, ew ê karibin wan bi karanîna alavên giran bibînin. Ev vebijarka herî baş e, ji ber ku rojên borî ji bo me pir dijwar û westiyayî bûn.

Li kolanên La Guaira, hejmara tîmên rizgarkirinê yên biyanî ku beşdarî operasyonên lêgerînê dibin hêdî hêdî kêm dibe. Tîmên rizgarkirinê yên ji Dewletên Yekbûyî, Tşîlî û welatên din dest bi amadekariyên derketinê kirine. Li gorî endamên tîman ku bi AFP re peywendî kirine, di nav wan de tîmên ji Daîreya Agirkujiyê ya Wîlayeta Los Angeles, herwiha tîmên ji Florida û Virginia hene. Piştî 72 demjimêran piştî karesatên bi vî rengî, şansê dîtina kesên ku sax mane kêm dibe.

Li gorî Saziya Lêkolînên Jeolojîk a DYA'yê, ev erdheja bi pileya 7,5'an ji sala 1900'an û vir ve ya herî bihêz a li Venezuelayê ye.

# Şikefta ku dîroka wê vedgere 400 hezar sal

**Navenda Nûçeyan**

**Li bakurê Îsraîlê şikefteke ku dîroka wê vedgere 400 hezar sal berê hat vedîtin. Ev şikeft bi hezarên salan parastina amûrên mirovan û bermahiyên lawiran kiriye, ew bi hezarê salan ji guhertinên xwezayî û mirovî parastî maye.**



Arkeolojî kêm caran rastî cihekî ku bi sed hezaran salan ji guhertinên xwezayî û mirovî hema bêje bi tevahî veqetandî mabe, tê.

Ev yek di şikeftekê de li nêzî Pardes, nêzîkî xaçerêya Zichron Ya'akov çêbû, ku lêkolînerên ji Desteya Antîkên Îsraîlê û Zanîngeha Hayfa cihekî ku dîroka wê di navbera 400 hezar û 250 hezar sal berê de ye, dikolin

Proje ji aliyê arkeolog Kobi Vardi û Amit Gabai, ligel Profesor Ron Shemelmets ve tê birêvebirin. Tîma projeyê vê deverê wekî yek ji keşfên herî girîng ên deh salên dawî de, ji bo têgihîştina qonaxek pêşveçûna mirovan ku delîlên kêm ji bo wê hatine parastin, bi nav dike.

Ev şikeft ji çanda bi navê Acheulean-Yabrudian tê hesibandin, ku kevneşopiyeke teknolojîk a cihêreng a rojhilat di serdema Paleolîtîka Jêrîn a Dereng de ye.

Li gorî lêkolîneran, rewşa wê ya parastinê ya bêhempa wê dike "kapsuleke demê" ya rastîn, dikare agahiyên li deverên din ên herêmê ku bi zehmetî têne bidestxistin, peyda bike.

**Demek girîng di dîroka cureyên mirovahiya me de**

Serdema ku ev cih pê ve girêdayî ye, beriya belavbûna Neanderthal û mirovên anatomîkî yên nûjen e. Pispor dibînin ku ew serdem veguherînên kûr di şêwazê jiyanê, ragihandinê û çawaniya jiyan bi jîngehê re bû.

Li gorî Schimmelmets, ew sal destpêka pêşketina reftaran bû, ku paşê di nav civakên mirovan de bûn serdest, di nav de avakirina komên mezintir, dagirkirina demdirêj a hin deveran û rêxistina civakî ya tevlihevtir.

Di nava nîşanên ku hatine dîtin ew bû ku agir bi awayekî mezin hatiye bikaranîn û mayînbûna demên dirêj di şikeftan de, ku ev yek bi gelemperî bi hevkariyeke mezintir di navbera kesan de û veguhestineke sîstematîk a zanînê di nav koman de ve girêdayî ye.

Lêkolîneran destnîşan kirin ku ev veguherîn hin bingehên çandî û teknolojîk danîne ku paşê dê Neanderthal û Homo sapiens ji hev cuda bikin.

**Amûr, hestiyên lawiran û hawîrdorek dewlemend bi çavkaniyan**

Di nav vedîtinên ku heta niha hatine belgekirin de hejmareke mezin ji amûrên kevirî hene ku bi teknîkên pêşketî yên wê serdemê hatine çêkirin; arkeologan kêrên destan ên piçûk, xêzik û kêrên birînê yên ku bi rastbûnek bilind hatine çêkirin dîtine.

Herwiha di xebatên kolandinê de bermahiyên lawirên wekî hespan, ga û kerên kovî, ligel delîlên hebûna avê li hawîrdorê, ew çavkaniyek bû ku dê herêmê ji bo komên nêçîrvan bikira cihekî balkêş.

Desteya Antîkên Îsraîlê û Zanîngeha Hayfa dixwazin bernameyeke lêkolînê ya berfireh pêş bixin, da ku rê bide ji nû ve avakirina şêwazê jiyana van komên mirovan, ka wan çawa çavkaniyên berdest bikar anîne û çawa teknolojiyên wan pêş ketine, nas bikin.

Piştî temamkirina lêkolînan, saziyên peywendîdar hêvî dikin ku cih ji bo serdanên giştî amade bikin, bi armanca ku van vedîtinan ji bo niştecihên herêmê, herwiha xwendekar û mêvanên ku bi pêşveçûna mirovan re eleqedar dibin, peyda bikin.

# Macron li Şamê ye: Fransa ji deriyê fireh vedigere

Cemîl Xoce

Parîs naxwaze ku ji Sûriyeya nû dereng bimîne. Ev peyama rastîn a li piştî serdana Macron bo Şamê ye. Serokê Fransayê ne tenê ji bo pîrozbahiyê diçe. Ew diçe da ku cihekî xwe di Sûriyeya bê de bigire, beriya ku hemû cih tije bibin. Ev serdan ne asayî ye. Ev yekem car e ku serokê dewleteke mezin a ewropî piştî hilweşîna rejîma Esed di peyzaja heyî ya li Sûriyeyê de cih digire. Macron dê bibe yekem serokê Fransayê ku ji sala 2009'an ve lingê xwe diavêje axa Şamê. Sembolîzma li vir ji protokolê mezintir e. Ew ragihandinek e ku Ewropayê bi awayekî fermî derî li ber desthilata nû ya li Şamê vekiriye.

### Çima niha

Dem bi awayekî hûr û kûr hatiye amadekirin. Macron tenê çend saetan beriya ku biçe Tirkiyeyê bo beşdarbûna lûtkeya NATO'yê, serdana Şamê dike. Ev tê wê wateyê ku Sûriye êdî bûye beşek ji hesabên ku ewlekariya herêmî û têkiliyên bi Tirkiyê re dihewîne. Fransa ne bi tenê û bêyî hevalbendên xwe tevdigere. Ew gavên xwe hem bi NATO'yê û hem jî bi Tirkiyeyê re di heman demê de hevaheng dike. Her wiha, herêm şahidê pêşbaziyeke germ a li ser nifûzê ye. Qeter li wir bû. Ûkrayna li wir bû. Seroka Komîsyona Ewropayê çend meh berê serdana Şamê kiribû. Her hêzek dixwaze cihekî xwe çêke. Fransa naxwaze ku ji vê pêşbaziyê dûr bikeve, nemaze ku dîrokeke wê ya dirêj bi Sûriyeyê re heye ku vedigere çend dehsalan, ji dema Mandata Fransî ya li ser Sûriyeyê di sedsala borî de. Ev dîrok dide barê Parîsê ku hest bi "mafeke xwezayî" bike ku vegere qada Sûriyeyê, heta eger ji ber şer gelek salan jê dûr mabû be jî.

### Pere ji siyasetê giringtir e

Li kesên ku bi Macron re hatine binêrin. Ne tenê dîplomat in, lê şandeyeke karsaz û kompaniyên mezin ên fransî jî pê re hatine. Ev hûrgilî her tiştî dibêje. Fransa dixwaze bibe ya yekemîn ku girêbestên ji nû ve avakirina Sûriyeyê îmze dike. Sektorên enerjiyê, veguhastinê û binesaziyê li Sûriyê dê di salên pêş de pêwîstiya wan bi bi milyaran dolaran hebe. Yê ku zûtir bigihêje, para herî mezin digire. Ev her tim mantiqa dewletên mezin e. Gotara siyasî derbarê "hevbeşî" û "îstîqrarê" de xweşik di zimanê wan de dixuye, lê li pişt perdeyê, girêbest, peyman û veberhênan hene. Fransa vê lîstikê ji dema Mandatê ve baş nas dike. Kompaniyên mezin ên fransî di warên enerjî, ragihandin û benderan de ev çend sal in li benda derfeteke wiha ne û her rojeke derengmayînê tê wateya ku dewletên din, mîna Tirkiye yan jî dewletên Kendavê, dê di vê pêşbirka aborî de gaveke din zûtir biavêjin.

### Dosyaya penaber û ewlehiyê

Aliyekî din ê girîng ê vê serdan heye. Ewropa ji dosyaya penaberên Sûriyê bifikar e. Parîs, weke paytextên din ên ewropî, dixwaze mercên ku destûrê bidin vegerandina dilxwazane û biewle ya van penaberan bibîne. Bê guman, ev ne helwesteke mirovî ye. Di heman demê de hesabên navxweyî yên têkildarî zexta siyasî û civakî li nav Ewropayê bi xwe hene, ku dosyaya penaberiyê li hema hema her dewleteke ewropî weke kaxezeke hestiyar di nîqaşên siyasî yên navxweyî de cih digire.

Dosyaya ewlehiyê jî bi awayekî xurt amade ye. Teqîna dawî ya ku qehwexaneyeke li Şamê kir armanc û bû sedema ku gelek kes jiyana xwe ji dest bidin, tîne bîra her kesî ku aramiya li Sûriyê hîn jî lawaz e. Ewropa dizane ku tevlîhevî li Sûriyê tê wateya metirsiyên terorê û koçberiya nerêkûpêk ku digihêje sînorên wê bi xwe. Lewma, aramiya Sûriyê ji bo Parîsê ne luksek e, lê belê berjewendiyeke rasterast e. Her tevlîheviyeke ewlehiyê ya nû li Şamê yan Helebê dê rasterast bandorê li navxweya Fransa û Ewropayê bike, çi bi rêya pêlên nû yên penaberiyê be, yan jî bi rêya çalakbûna şaneyên tundrew be.

### Naskirina bêşert û mercên temambûyî

Ev serdan hêzeke dîplomatîk a mezin dide desthilata nû ya li Şamê. Lê ev nayê wê wateyê ku hemû derî bê berdêl hatine vekirin. Dosyayên neçareserkirî pir in: reformên siyasî, mekanîzmayên avakirina nû, xwezaya rêveberiyê û têkiliya bi pêkhateyên cuda yên li Sûriyê re. Ewropa bi hişyariyeke hesabkirî tevdigere. Destê xwe vedike, lê di heman demê de çavdêriyê dike.

Yek ji wan dosyayên ku dê di her diyalogeke cidî de amade bin, rewşa kêmaran û pêkhateyên cuda yên li Sûriyê ye, ji Kurdan bigire heya Druzî, Xiristiyan û yên din. Lewra her nêzîkatiyeke ewropî ku van dosyayan bi ciddî negire, dê di dawiyê de kurtbîn xuya bike, ya ku zêdetir li ser hesabên aborî yên demkurt hatiye avakirin ne li ser bingehê dîtineke demdirêj ji bo Sûriyeke bi rastî aram.

Li vir pirseke ku divê bi zelalî were pirsîn heye: Gelo ev hevkariya aborî û siyasî dê ji bo hemû pêkhateyên Sûriyê be? Yan dê tenê bi Şama navendî re werin avakirin û herêmên wekî Bakur û Rojhilatê Sûriyê li derveyî hesabên wan bimînin? Tecrubeya Sûriyê fêrî me kiriye ku her hevkariyeke ku cudahiyan li ber çavan negire, dê hevkariyeke lawaz û demkurt be, çi qasî li ser kaxezê yan di daxuyaniyên lûtkeyên fermî de bi hêz xuya bike jî.

Serdana Macron destpêka qonaxeke nû temsîl dike. Parîs ji helwesta temaşevan derbasî helwesta lîstikvaneke rastîn di diyarkirina paşeroja Sûriyê de dibe. Lê paşeroja rastîn a Sûriyê ne tenê li koşkên Parîsê yan Şamê wê bê çêkirin. Wê tenê dema ku hemû pêkhateyên vî welatî, bi hemû rengînî û cudahiyên xwe ve, beşdarî biryardana çarenûsa xwe bibin, bê avakirin. Ev ezmûna rastîn e ku wê diyar bike ka ev vebûna ewropî wê Sûriyeke bi rastî aram ava bike, yan tenê rûyeke nû ya ji bo peymanên kevin be, ku di navbera her krîzeke nû de lez diqelibe û lawaziya xwe eşkere dike.

# Lêgerîna rêziknameyeke herêmî ya nû û pêşeroja pirsgirêka Kurd

Botan Amed

Şerê dawî yê li Rojhilata Navîn divê tenê wekî pevçûnek leşkerî ya sînorkirî di navbera Îran û Îsraîlê de neyê dîtin. Rewşa encam nîşan dide ku pêvajoyek veguherînek berfireh heye ku tê de hevsengiya hêza herêmî ya piştî Şerê Sar hatî şekildan ji nû ve tê nirxandin, têgehên ewlehiyê diguherin, û pêşîniyên dîplomatîk ji nû ve têne pênasekirin. Ji ber vê yekê, pêşketinên îroyîn dikarin ne wekî krîzek kurt-dem, lê wekî destpêka serdemek jeopolîtîk a nû ku dê bandorê li gelek salên pêş de bike werin şîrove kirin. Di rojên destpêkê yên şer de, kapasîteya leşkerî faktora diyarker bû. Lêbelê, bi derbasbûna demê re, eşkere bû ku dîplomasî, berxwedana aborî, torên îstîxbaratê û têkoşîna ji bo rewatiya navneteweyî bi kêmanî bi qasî hêza leşkerî girîng bûn. Vê rewşê careke din nîşan da ku pevçûnên nûjen ne tenê li qada şer lê di heman demê de di warên siyasî, aborî, teknolojîk û raya giştî de jî têne meşandin. Rastiya ku agirbest hatiye bidestxistin nayê wê wateyê ku pêşbaziya li herêmê bi dawî bûye. Berevajî vê, têkoşîn bi şîdeta kêmtir lê bi amûrên tevlihevtir berdewam dike. Di serdema pêş de, danûstandinên dîplomatîk, mekanîzmayên zexta aborî, çalakiyên îstîxbaratê û têkiliyên wekîl dê hêmanên bingehîn ên pêşbaziya herêmî bin. Ji ber vê yekê, xuya dike ku aştî û pêşbazî dê demek dirêj li Rojhilata Navîn bi hev re bijîn. Di vê serdema nû de, pirsgirêka Kurd dê yek ji mijarên girîng di mîmariya ewlehiya herêmî de bimîne. Ev ne tenê ji ber mezinahiya nifûsa Kurd e, lê di heman demê de ji ber ku erdnîgariya ku Kurd lê dijîn li ser xetên enerjiyê, korîdorên bazirganiyê û deverên transîtê yên stratejîk e. Ev rastî nîşan dide ku aktorên herêmî û cîhanî dê bi pirsgirêka Kurd re eleqedar bibin . Lêbelê, yek ji dersên stratejîk ên herî girîng ên ku di vê heyamê de derketiye holê ev e ku krîzên herêmî dikarin di heman demê de hem xetere û hem jî derfetan ji bo gelên bêdewlet biafirînin. Xetere zextên ewlehiyê yên zêde, qelsiyên aborî yên kûrtir û bandorên nerasterast ên pêşbaziya hêza derveyî li ser civakên herêmî vedihewîne. Berevajî vê, demên ku pêvajoyên dîplomatîk lez dibin dikarin ji bo aktorên herêmî derfetên nû biafirînin da ku kapasîteya xwe ya temsîla siyasî xurt bikin û xuyabûna xwe ya navneteweyî zêde bikin. Di vê çarçoveyê de, eşkere ye ku pêşkeftinên leşkerî dê ne tenê faktora ku serkeftina siyasî ya demdirêj diyar dike be. Kapasîteya sazûmanî, hevgirtina civakî, domdariya aborî, rewatiya qanûnî û şiyana birêvebirina têkiliyên navneteweyî bi awayekî hevseng dê di pêşerojê de pir biryardartir bibin. Di jeopolîtîka îroyîn de, aktorên ku bandorên mayînde diafirînin ne tenê ew in ku bertek nîşanî krîzan didin; Ev aktor in ku dikarin pêşbînîya hevsengiyên guherbar bikin û stratejiyên guncaw pêş bixin. Krîza dawî ya di eksena Îran-Îsraîl-Amerîkayê de dersên girîng di vî warî de pêşkêş dike. Rêbaza pevçûnan nîşan dide ku hevsengiyên hêza herêmî çiqas zû dikarin biguherin; berevajî vê, hesabên stratejîk ên demdirêj dikarin ji serkeftinên leşkerî yên kurt-dem girîngtir bin. Ji ber vê yekê, encama rastîn a şer ne tenê li qada şer, lê di heman demê de di têkiliyên dîplomatîk, hevkariyên aborî û rêziknameyên ewlehiyê de ku dê di salên pêş de şekil bigirin jî, dê bi zelalî were dîtin. Di encamê de, Rojhilata Navîn ketiye serdemeke nû ya nezelaliyê. Di vê serdemê de, eşkere ye ku tu aktorek yekane xwedî serdestiyeke mutleq nîne ku rêziknameya herêmî diyar bike. Di vê jîngeha nû ya jeopolîtîk de, ku navendên hêzê cihêreng bûne, hevpeymanî nermtir bûne, û rola aktorên herêmî zêde bûye, tê fêmkirin ku aramiya mayînde ne tenê bi rêya hevsengiya leşkerî, lê di heman demê de bi rêya pêvajoyên siyasî yên berfireh, dîplomasiya domdar û nêzîkatiyên ku ewlehiya civakan didin pêşiyê mimkun e. Ji ber vê yekê, mîrata herî girîng a şer ne tenê wêranî ye, lê di heman demê de nîqaşa berdewam a li ser prensîbên ku divê rêziknameya herêmî li ser wan ji nû ve were avakirin jî ye. Salên pêş de dê encamên pratîkî yên vê nîqaşê û pêşketinên ku dê nexşeya siyasî ya nû ya Rojhilata Navîn şekil bidin, bibînin.



# NATO; Ji avabûnê heta lûtkeya Enqerayê

**Di demekê de ku kirîzên cîhanê gihaştine lûtkeyê û têkiliyên endamên NATO'yê di qonaxeke hestyar re derbas dibe, lûtkeya NATO'yê li Tirkiyê tê lidarxistin. Tirkiyê jî her dem endamtiya xwe ya NATO'yê ji bo berjewendiyên xwe yên leşkerî, aborî û dijberiya li hemberî destkeftiyên Kurdan bi kar tîne.**

Şaho Xanim/Qamişlo



Peymana Atlantîka Bakur (NATO), hevbendiyeke leşkerî û siyasî ya navneteweyî ye ku di 4'Nîsana 1949'an de li Washingtonji aliyê 12 welatên damezrîner ve hate avakirin. Armanca wê ya bingehîn parastina hevpar a li dijî geşbûna Yekîtiya Sovyetê yaw ê demê û parastina ewlehiya herêma Euro-Atlantîkê bû û heta sala 2026'an, hejmara endamên NATOyê gihîştiye 32 welatan.

### Bingeh û Avabûna NATOyê

Di sala 1949'an de piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, Ewropa di aliyê aborî û leşkerî de wêran bibû. Ew ditirsiya ku Yekîtiya Sovyetê ya wê demê kontrola xwe li seranserî parzemîna Ewrpoayê berfireh bike. Ji bo bersivdana vê metrsiyê, di sala 1948'an de Peymana Brukselê di navbera 5 welatên Ewropî de hate îmzekirin, ku ev yek bingeha NATOyê ava kir.

Di 4'ê Nîsana 1949'an de, 12 welat hatin bahev û Peymana Atlantîka Bakur (Peymana Washingtonê) îmze kirin. Welatên damezrîner ev bûn: ( Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Brîtanya, Fransa, Kanada, Îtalya, Belçîka, Holanda, Luksembûrg, Norwêc, Danîmarka, Îzlanda û Portûgal).

### Xala 5'an

Benda herî girîng a peymana di navbera endamên Natoyê de Xala 5'an e. Li gorî vê xalê, "êrîşeke çekdarî ya li ser endamekî NATO, wekî êrîşeke li ser hemû endamên wê tê hesibandin" û mafê parastina hevpar dide welatên endam. Di dîroka NATOyê de Xala 5'an tenê yek carê hate xebitandin, ew jî piştî êrîşên 11'ê Îlonê ya sala 2001'an li ser Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Ev bû sedem ku NATO operasyonên leşkerî li Afganistanê bide destpêkirin.

### Firehbûna NATO'yê

Di serdema Şerê Sar de ku ji sala 1949 heta 1991'an dewam kir, NATO wekî mertalekî li dijî Bloka Rojhilatê ya di bin serkêşiya Sovyetê de bû, xebitî. Ji bo bersivdana NATOyê, Sovyetê di sala 1955'an de Peymana Varşovayê bi welatên komunîst re ava kir.

Di dema Şerê Sar de, sê pêlên berfirehbûnê yê NATO'yê çêbûn. Di sala 1952'an de, Tirkiye û Yewnanîstan bûn endamê wê. Di sala 1955'an de Almanya û di 1982 Îspanyayê, tevlî wê bûn.

Navenda NATOyê ya yekem li nêzî Parîsê (Fransa) bû, lê piştî ku Fransa di sala 1966'an de ji bin fermandariya leşkerî ya yekbûyî derket, navend birin paytexta Belçîkayê, Brukselê.

### Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyêtê

Bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetê di sala 1991'an de, rola NATOyê guherî. Hevbendî ji polîtîkayeke tenê ya parastinê, ber bi destwerdanên krîzê ve çû. Gelek welatên ku berê endamên Peymana Varşovayê an jî komarên Sovyetê bûn, berê xwe dan NATOyê.

Di sala 1999'an de Komara Çîk, Macaristan û Polonya tevlî NATO bûn, di sala 2004'an de Estonya, Letonya, Lîtvanya, Bulgaristan, Romanya, Slovakya û Slovenîya tevlî NATO bûn. Di sala 2009'an de Albanya û Kroatya tevlî bûn. Di sala 2017 Montenegro û di 2020'î de Makedonyaya Bakur tevlî NATO bûn.

### Piştî êrişên Rûsya li ser Ukraynayê

Êrîşa Rûsyayê ya li ser Ûkraynayê di Sibata 2022'an de, hawîrdora ewlehiyê ya Ewropayê bi temamî guherand û girîngiya parastina herêmî ya NATOyê dîsa xist rojevê. Ev şer bû sedem ku welatên Fînlenda û Swêdê ku bi salan bêalî bûn, daxwaza endamtiyê bikin. Di Nîsana 2023'an de Fînlenda bi fermî bû endamê 31'ê yê NATOyê. Di Adara 2024 de piştî pejirandina hemû welatan Siwêd jî bû endamê 32'an.




### Tirikyê û NATO

Tirkiye wekî yek ji endamên herî kevn ji sala 1952'an ve û xwediyê artêşa duyem a herî mezin a NATOyê, endamtiya xwe ya di vê peymanê de ji bo parastina berjewendiyên xwe yên desthilatdarî bi kar tîne. Ew ji bo berjewendiyên siyasî û leşkerî daxwazên endamtiyê yên welatên nû yan jî biryarên girîng ên peymanê asteng dike an jî dereng dixe da ku tawizan ji welatên rojavayî bigire. Di dema daxwaza endamtiya Swêd û Fînlendayê (2022-2024) de, Enqereyê mafê xwe yê vîtoyê bi kar anî. Bi vê gavê, zextê li ser wan welatan kir da ku qanûnên xwe yên li dijî tevgerên Kurdî hişk bikin, ambargoyên çekan ên li ser Tirkiyeyê rakin, û firotina firokeyên F-16 ji aliyê DYAyê ve misoger bike. Di heman demê de, ji bo hilbijartina sekreterên giştî yên NATOyê, mercên xwe ferz dike. Herwiha bi rêya endamtiya xwe ji NATO re hewil dida ku êrişên xwe yên li Sûriyê û Iraqê di şerê li dijî gelê Kurd rewa bike. Tirkiye bi domdarî hewl dide ku kerta "ewlehiya neteweyî" bixe nav rojeva NATOyê.

Li aliyekî din Tirkiyê di bin sîwana NATOyê de pîşesaziya xwe ya leşkerî pêş xistiye. Di seranserê salan de, bi rêya transferkirina teknolojiyê û bernameyên hevpar ên NATOyê, bingeha pîşesaziya xwe ya çekan ava kir.Ev yek rê dide ku Tirkiye çekên xwe bifroşe welatên din ên NATOyê an jî hevalbendên derve û aboriya xwe xurt bike

Tirkiye pêgeha xwe ya di NATOyê de bi kar tîne da ku di navbera Rûsya û Bloka Rojavayî de rola navbeynkariyê bilîze. Tevî ku endamê NATOyê ye, sîstema parastina esmên a S-400 ji Rûsyayê kirî. Gava ku NATOyê bertek nîşan da, Enqereyê jeopolîtîka xwe wekî mertal bi kar anî da ku ji derbkirina potansiyel a peymanê dûr bikeve. Di şerê Rûsya û Ûkraynayê de, wekî "endamê taybet ê NATOyê" peymana genim a Deryaya Reş îmze kir û têkiliyên aborî û enerjiyê bi Moskovayê re nebirrî. Tirkiye sîstema parastina hevpar a NATOyê ji bo ewlehiya sînorên xwe yên bi Sûriye û Iraqê re bi kar tîne. Di dema şerê Sûriyê de, Tirkiyê daxwaza alîkariyê ji NATOyê kir û sîstemên moşekî yên Patriot li ser sînorên Tirkiyeyê hatin bicihkirin da ku asmana wê biparêzin. Ev yek nîşan dide ku Tirkiye gava hewce bike, lêçûna ewlehiya xwe dixe ser milê hevalbendên xwe. Bi kurtasî, Tirkiye NATOyê ne tenê wekî îttifaqeke dilsoz, lê wekî "maseya danûstandinê ya fersendperest" dibîne ku her carê ji bo berjewendiyên xwe yên leşkerî, aborî û dijberiya li hemberî destkeftiyên Kurdan bi kar tîne.

### Gefên Donald Trump li hemberî NATOyê

Gefên Donald Trump li hemberî NATOyê bi giranî li ser kêmkirina piştgiriya aborî û leşkerî ya Amerîkayê û gefa vekişîna ji tifaqê ne, bi taybetî zextê li endaman dike ku budceya parastinê zêde bikin. Ew van welatan rexne dike ku erka xwe ya parastinê bi cih naynin û di aloziyên herêmî de piştgiriya Washingtonê nakin.

Trump armanca berê ya xercên leşkerî ku ji sedî 2 ji Dahata Neteweyî ya Sereke (GDP) bû, bilind kiriye û daxwaza ji sedî 5 dike. Hevalbendên wî yên mîna Almanya, Kanada û Spanyayê ku hîn nagihîjin vê astê, rûbirûyê gefên tund dibin. Pentagonê hişyarî daye ku eger welat budçeyên xwe zêde nekin, dê leşkerên Amerîkî ji wan welatan mîna Almanya û herêmên din ên Ewropayê werin vekişandin.

Trump herî dawî diyar kir ku ji bo Amerîkayê ne mentiqî ye ku trîlyon doleran xerc bike bêyî ku sûdekê wergire. Li aliyê din Washington nerazî ye ku welatên Ewropî di şer û aloziyên Rojhilata Navîn de piştgiriya leşkerî nedan Amerîkayê û rê nedan ku baregehên hevpar werin bikaranîn. Trump rasterast gefê dixwe ku heke welatek erka xwe ya aborî bi cih neyne, Amerîka dê di dema êrîşekê de parastina wî welat neke. Herwiha Trump daxwaz dike ku NATO di destxistina girava Gronlandê de rola rêberiyê bileyîze.

### Lûtkeya NATO ya Enqerayê

Li gorî geşedanên herî dawî yên sala 2026'an, NATO di lûtkeya xwe ya bê de ku wê 7 Tîrmehê bê lidarketin, giranî bide ser zêdekirina budçeya parastinê ya welatên endam, xurtkirina sîstema parastina esmên û piştgiriya domdar a ji bo Ukraynayê.


# ‘Rêber Apo gavên pêvajoyê destnîşan kiriye, lê Tirkiyê wan gavan navêje’

Parêzer û çalakvanê hiqûqî, Mihemed El-Neîmî diyar kir ku Rêber Apo hemû gavên pêwîst ji bo serkeftina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk destnîşan kiriye, lê heta niha Tirkiyê gavên hiqûqî yên pêwîst neavêtiye û ev yek pêvajoyê dixe metirsiyê.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê qanûna çarçoveyê ku li Bakurê Kurdistanê di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de amadekariyên wê têne kirin, Parêzger û çalakvanê hiqûqî, berdevkê Însiyatîfa Parêzerên Sûriyê Mihemed El-Neîmî bersiva Pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:





**Zêdetirî salekê pêvajoya aştiyê li Bakurê Kurdistanê hatiye destpêkirin, di nava vê salê de gelek pêşketin û gavên girîng hatin avêtin, lê piraniya gavan di aliyekî tenê de sînordar bû, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Pêvajoya aştiyê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bi banga Rêber Apo dest pê kir. Ew bang bi navê “Banga Aştî û Civaka Demokratîk” hate ragihandin. Li ser bingeha vê bangê, Tevgera Azadiyê bersiv da. Ev bersiv bi rêze gavên pratîkî hate nîşandan. Gava yekem ragihandina agirbestê di 1’ê Adara 2025 de bû. Piştre Kongreya 12’emîn a Tevgerê di navbera 5 û 7’ê Gulana 2025’an de hate lidarxistin. Kongreyê gelek biryar standin ya herî girîng girêdana sepandina pratîkî ya biryarên konferansê bi azadiya Reber Apo û avakirina komek bi navê Koma Aştiyê bû. Koma Aştiyê jî di 11’ê Tîrmeha 2025’an de bi merasîmeke taybet û bêhempa çek şewitand. Piştî wê jî Hêzên Parastina Gel ji cihên têkiliya rasterast an ku rîsk lê rû didan bi artêşa Tirkiyê re, vekişiyan bo Herêmên Parastina Medya yê. Li gel van gavên dîrokî, Rêber Apo gelek peyam ji konferansên navneteweyî re şandin ku bi Konferansa Navneteweyî ya ji bo Aştî û Civaka Demokratîk a ku di 6 û 7’ê Kanûna 2025’an de li Stenbolê hate lidarxistin dest pê kir û bi konferansa yekem a Yekîtiya Lêkolînên Îslamî ya Mezopotamyayê di Hezîrana 2026’an de bi dawî bû. Herwiha tiştên ku wî ji şandeyên fermî yên ku piştî banga wî ya dîrokî serdana wî kirin re vegotin û nameya ku bi bîranîna salvegera Banga Aştî û Civaka Demokratîk a 27’ê Sibata 2025’an de weşand jî girîng bûn. Di dawiyê de Rêber Apo ji rojnameya Komînal re di hejmara destpêka meha Tîrmehê de peyamek şand. Di wê de bang kir ku ji teorî û gotinên bêkiryar derbasî karê pratîkî bibin, ji ber ku bawer e dewleta Tirkiyê hîn jî ji daxwazên Banga Aştî û Civaka Demokratîk û gavên pratîkî yên hatine avêtin, dûr e. Li gorî me jî pergala fermî ya Tirkiyê di nêzîkbûna xwe ya li hember daxwazên Banga Aştî û Civaka Demokratîk de ne rastgoy e. Ji ber ku hêvîya xwe li hin aliyên herêmî yên ku xwe di nav biryardêrên navneteweyî de dixin girê dide. Ev rewş dijberiya xwediyên dewleta kûr e ku mezinahiya metirsiyê li ser Tirkiyê dibînin û bawer in ku ji bo berjewendiya Tirkiyê divê bersivek rastîn ji Banga Aştî û Civaka Demokratîk re were dayîn, da ku metirsiyên mezin di serî de metirsîya parçekirinê, bêne dûrxistin.

**Ji bo serkeftina pêvajoyê ji dewleta Tirk gavên hiqûqî pêwîst dike, lê dewletê van gavan li gorî berjewendiya xwe ya siyasî dereng dixîne, ev çi dide diyarkirin û pêwîst e çi were kirin?**

Rêber Apo di peyama xwe ya bi boneya salvegera yekem a banga Aştî û Civaka Demokratîk de, dîsa girîngiya pêwîstiya avêtina gavên mafî û qanûnî ji aliyê dewleta Tirkiyê ve tekez kir. Wiha got: “Armanca me bidawîkirina qonaxa siyaseta ku li ser tundûtûjiyê ava bûye ye û vekirina rêyek e ku li ser civaka demokratîk û serweriya qanûnê ava bibe.” Herwiha ev yek lê zêde kir û got: “Em parêzvaniya çareseriyeke qanûnî di çarçoveya siyaseta demokratîk de dikin. Em hewce ne bi nêzîkbûnek ku rê li ber demokrasiyê veke û ji bo wê garantiyên qanûnî yên bihêz ava bike.” Divê were zanîn ku Rêber Apo, ji bangewaziya xwe ya dîrokî dest pê kir, piştî wê bi hevdîtinên ku hatin lidarxistin berdewam kir û bi peyamên xwe yên ji bo kongreyan, gelê Kurd û gelên din ên azadîxwaz di Newroza 2026’an de, di 8’ê Adara 2026’an de bi boneya Roja Cîhanê ya Jinan, herwiha ji bo civaka Kurd a li dîasporayê û rêberên Kurd re, her dem li ser pêdiviya lezgirtina Tirkiyê ji bo avêtina gavên siyasî û hiqûqî yên pêwîst rawestiya. Ev gav divê bi rêya pakêtek qanûnên ku entegrasyona demokratîk garantî dikin û bi parastina destûrî, da ku veguherîne ber bi komara demokratîk ve ku li ser bingeha naskirina hevbeş be û ne berevajî vê yekê. Tişta ku Rêber Apo di 27’ê Adara 2026’an de, di civîna ku Şandeya Îmraliyê ya Partiya Wekhevî û Demokrasiya Gelan tê de amade bû de, got yek ji girîngtirîn qonaxên bangewaziya Aştî û Civaka Demokratîk bû. Wî tê de berpirsiyarî û erkê dîrokî yê ku li ser milê Meclisa Mezin a Neteweyî ya Tirkiyê (Parlamento) ye di vê pêvajoyê de destnîşan kir. Herwiha hate ragihandin ku pêwîst e piştî rapora komîteya parlamentoyê, karên ku dê werin bicîhkirin bêyî ku ew ji faktora demê re were hiştin, divê di çarçoveyek qanûnî ya hevgirtî de were bicîhkirin. Di çarçoveyeke qanûnî ya bihêz de bikevin meriyetê, da ku tişê herî girîng ku di banga Aştî û Civaka Demokratîk ya 27’ê Sibata 2025’an de pêk were, ango gihîştina aştiyê bi Komarê re, bi rêya pakêteke destkeftiyên qanûnî ku li ser bingeha destûrî ava bûne. Rêber Apo hemû gavên ku divê Tirkiyê bavêje, bi taybetî di derbarê derxistina qanûnek li ser entegrasyona demokratîk û azadiyê de, ji bo Tirkiyê destnîşan kiriye. Heger Tirkiyê van gavan neavêje tevî hemû gavavêtinên Tevgera Azadiyê, ew ê bibe berpirsyarê neserxistina pêvajoya aştiyê. Ev mijar di 28’ê Gulana 2026’an de di civîna fermî ya navbera Rêber Apo û şandeya fermî ya serdankirî de dîsa li ser şertên Banga Aştî û Civaka Demokratîk hate piştrastkirin. Ji ber ku Tirkiyê hîn jî li ser berjewendiyên xwe yên siyasî û serdestiyê şert dike, pirrengî û cihêrengiyê red dike, bi zihniyeta neteweperestî û navendperestiyê ve girêdayî dimîne, Kurdan weke metirsiyeke hebûnî dibîne û welatên cîran wek qada firehbûnê û derfeteke ji bo telafîkirina kirîza hundirîn dibîne. Ji ber vê yekê, dengvedana rastîn a Bangewaziya Aştî û Civaka Demokratîk li Tirkiyê heta îro jî prensîba serketina li ser yê din nîşan dide, ne avakirina hevkarî û baweriyê li gorî dîtina Rêber Apo. Ev jî dibe sedem ku Tirkiyê ji aştî û ewlehiyê zêdetir nêzî metirsiyên hundirîn û derveyî be.

**Di dema dawiyê de amadekariyên çarçoveya hiqûqî rojeve, lê wekî tê diyarkirin ev çarçove ne li gorî pêvajoyê û rastiya heyî ye, ji bo wê di aliyê hiqûqî de divê çarçoveya vê yekê çawa be?**

Di vê demê de heta niha tu nîşanek tune ye ku Tirkiyê derbarê pakêta qanûnên demokratîk de amadekariyên xwe kiriye. Delîla vê yekê ew e ku biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê yên ku ji sala 2014’an ve hatine derxistin, heta niha nehatine cîbicîkirin. Herwiha daxwazên Komîteya Wezîran a Meclisa Yekîtiya Ewropî jî ku di dawiya meha Hezîranê de gihiştine asta dawîn, nehatine cîbicîkirin. Ji ber vê yekê pêdivî ye ku dosyayek taybet ji bo vê mijarê were amadekirin ku tê de binpêkirinên Tirkiyê yên mafên mirovan û hiqûqa navneteweyî bêne tomar kirin, bi taybetî ji aliyê nepejirandina Mafê Hêviyê û nebûna guhertinên di qanûnên hundirîn de. Di dawiyê de divê were zanîn ku Tirkiyê di nav kirîzeke navxweyî û derveyî de dijî û ji bilî pabendbûna bi Aştî û Civaka Demokratîk ti çareseriyek ji bo vê nîne.



# Zindawerên çand û hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Gulbuhar; Dengê bîranîna Kurdî û parêzvana awaza Kurdî ya resen”.

Hunermend û stranbêjên Kurd ên jin rolek bingehîn lîstin di parastina mîrata çandî, ziman û nasnameya kurdî de, bi taybetî di serdemên tepeserkirin, çewsandin û hêmûrkirina zimanê kurdî û qedexekirina bikaranîna wê di nivîsandin û derbirîn de.

Di destpêka sedsala borî de, hunermendên jin ên kurd rastî zextên giran hatin ji aliyê malbat û civakê ve, ku derketina wan di qada stranbêjiyê de red dikirin û ew vê yekê wekî derketina ji kevneşopiyên serdest dihêsibandin.

Hunermend Gulbuhar mînaka herî berbiçav a vê êşê ye û yek ji dengên jin ên wêrek e ku li dijî zilma civakî derketiye pêş, ew bi sînor û neheqiyên civakê re rû bi rû ma, lê wê stran û afirînerî kir û jiyana xwe ji bo xizmeta gelê xwe û doza wî terxan kir.

Wê bi stran û awazên xwe rolek girîng lîst di parastina mîrateya çandî , ziman û nasnameya kurdî de, ew bû dengekî hunerî yê berxwedêr û nîşaneyekî nemir ji bo pêdarî û berxwedana jina kurd.

Hunermenda Kurdî Gulbuhar yek ji stêrkên hunera Kurdî ya resen tê hesibandin, û semboleka berbiçav a stranbêjiya jinên kurdî tê dîtin ; ji ber ku ew di demekê de derket ku stranê kurdî ji dengê jinan bêpar bû, lewra wê ew valahî bi dengê xwe yê bêhempa û bi şayesteyeke berbiçav tijî kir.

Ew bi rêya Radyoya Bexdayê navdar bû, û zêdetir ji nîv sedsalê bi dengê xwe yê xweş û taybet xizmeta hunera kurdî kir.

Gulbihar di wê serdemê de wek pêşenga nûjeniyê di huner û stranbêjiya Kurdî de tê dîtin, ji ber ku wê stranên ciwanan ên bi rîtmeke lez û sivik û bi belavkirina nûjen pêşkêş dikir, wê di nûkirina çêja muzîka Kurdî de rolek lehîst û stranên wê hîn jî di dilê gelê wê de cihekî taybet digirin û dengê wê hîn jî bi nermî û şêrînî diguhên mirovan vedide ,ew xwişka hunermenda Kurd Fewziya Mihemed e.

Hunermenda Kurd Gulbuhar (Fatima Mihemed Ehmed Elî) di sala 1932’an de ji dayîk û bavek Kurd li gundê Marşemûna Suryanî li Colemêrgê li Bakurê Kurdistanê hatiye dinya yê û eslê wê vedigere navçeya Amîdiyê ya ser bi parêzgeha Dihokê.

Ji ber nakokiyên malbatî, malbata wê koçberî wê derê bû, piştre piştî çend salan vegeriya herêma xwe ya resen Amîdiyê û li hin gundên derdora wê rûnişt.

Li gundê Badereşkê bavê wê jiyana xwe ji dest da dema ku ew hîn biçûk bû, û piştî wê malbat neçar ma ku koçî bajarê Mûsilê bike,li wir çû dibistanê û xwendina xwe ya seretayî û amadeyî berdewam kir.

Di sala 1949’an de malbat koçî Bexdayê kir û li wir bi cih bû, lê şert û mercên dijwar ên jiyanê nehişt ku ew xwendina xwe bi bidomîne.

Şarezayiya wê ya hunerî û hezkirina wê ji stran û muzîkê re di temenekî biçûk de dest pê kir û xwîşka wê Fewziya Mihemed bandoreke mezin li ser wê kir bû, lewra ew wek stranbêjek û hunermenda şanoyê tevlî koma koralê ya Radyoya Îraqê dibe.

Paşê tevlî koma Yehya Fayîq dibe û piştî wê jî tevlî Koma Hunerî ya 14’ê Tîrmehê dibe, bi rêya van koman navdar bû û deriyên beşdarbûna di karên televîzyonî de li Bexdayê li ber wê vebûn.

Ji bilî beşdarbûna wê di hin fîlmên sînemayî de, wek fîlma “Gula Sor” û “Bûka Firatê” de û her wiha ew di fîlmeka derhênerê navdar Yûsif Wehbî de jî beşdar bûye û bi vî awayî ew di salên pêncî û şêstî yên sedsala borî de ket nav cîhana navdarî û şanaziyê wek hunermendeka navdar a Îraqî.

Ew yek ji pêşengên hunermendên kurd ên Îraqî bû ku li seranserê Iraqê derket ser dikê û li kêleka hunermendên mezin ên Îraqî wek Yehya Fayîq, Fewzî Muhsin El-Emîn, Esed Ebdulrezaq, Ziya El-Beyatî û yên din lîst.

Lê rêya navdariyê ne hêsan bû û ne jî bi gulan xemilandîbû. Belê, diviyabû bi civaka kevneperest re rûbirû bibûya û bi hemû hêza xwe li dijî kevneşopiyan û adetên xwe bisekiniya, da ku bikaribe li esmanê hunerê bifire û deng û hebûna xwe ferz bike.

Heta destpêka salên şêstî yên sedsala borî , ew tenê wek lîstikvan û stranbêjek di nav civaka Iraqê de dihat naskirin ,bi saya hebûna xwe di radyo û televizyonê de, wê gelek hunermendên kurd nas kir ku berê dihatin Radyoya Bexdayê - beşa zimanê kurdî - ji bo tomarkirina stranên xwe. Dema ku li deng û rewaha wê guhdarî kirin, bi wê matmayî man û ew teşwîq kirin ku bi zimanê dayikê stranan bêje , ew di cih de razî bû, bi vî awayî di rêwîtiya xwe ya hunerî de qonaxek nû û girîng dest pê kir.

Wê heta sala 1961’an li Radyo û Televîzyona Bexdayê xebatê xwe berdewam kir, bi pêşniyara rêvebirê wê demê yê Beşa Kurdî ya Radyoyê, mamoste Ehmed Xelîl, biryar da ku yekem stranên xwe bi zimanê kurdî bêje û wan di sala 1963’an de tomar bike,helbesta ya helbestvan Mihemed Emîn Osman bû, bi rêya wê stranê ew bi hêz û quwet derbasî cîhana huner û stranbêjiya kurdî bû , û cihê xwe di nav rêza pêşîn a hunermendên kurd de girt.

Wê berdewam kir û jimareke mezin ji stranan, ku nêzîkî 272 stranan, di radyoya kurdî de tomar kir, ta ku di sala 1987’an de hat xanenişînkirin. Gotinên van stranan ji aliyê komek helbestvanên navdar ve hatine nivîsandin, di nav wan de (Mihemed Emîn Osman, Dr. Bedirxan Sindi, Ebdulhafiz Mayî, Mahfûz Mayî, Sebrî Botanî, Sekevan Ebdulhakîm, û Fexredîn Dûskî ) û awazên wê ji aliyê awazdêner û hunermendên mezin ve hatine çêkirin, mîna (Ehmed Xelîl, Nazim Na‘îm, Yasin Şeyxê, Semîr Zaxoyî, Mihemed Qedrî, Cemal Celal, Beşar Mihemed) û yên din.

Ew bi xortekî ji Bexdayê re, ku xwendekarê Zanîngeha Amerîkî bû, zewicî û ji wî zarokekî çêbû, navê wê kirin Bêrîvan.

Hunermenda kurd Gulbuhar yek ji mezintirîn stranbêjên jin tê hesibandin ku pir tişt li stranbêjiya kurdî zêde kirine û gelek kes wê wek pêşenga nûjeniyê di huner û stranbêjiya kurdî de dibînin, ji ber ku wê stranên ciwanan bi rîtmên lez û ruhê nûjen pêşkêş dikir.

Gulbuhar, ew hunermenda resen, dengê xwe li herêmên Iraqê û derveyî wê bilind kir, di demekê de ku hunera resen di lûtkeya geşbûna xwe de bû, hema hema tu rojek derbas nedibû ku Radyoya Kurdî bernameyên xwe yên sibehê bi dengê şêrîn û aza ê Gulbihar venedikir, û wê strana «Kewa Spêde bi xwîne her bi xwîne» digot.

Stranên wê bi kûrahiyeke mirovî û hestekî civakî dihatin nîşankirin,ji ber ku ew xwedî hestekî nazik û dilê nerm bû, wê ji bo jin ,zarok ,evîndar, ciwan û dayikan stran digot, û weke hunermendên din ên kurd, wê jî ji bo xweza û bedewiya Kurdistanê jî stran gotine, çawa ku ji bo azadî û rûmetê gotiye.

Di heyama rêwîtiya xwe ya hunerî de, Gulbuhar bi sedan stran pêşkêş kirine ku hîn jî di bîra gel û hezkirên wê de hatine xêzkirin.

Ji stranên wê yên ku di nav gelê kurd de deng vedane :

- Kewa Spêde Bi Xwîne
- Çinara Ser Rûbarê
- Wî Lolo Delal Lolo
- Min Tu Dîvit
- Dilo Te Ez Hêlam
- Bila bila
- Ezim Yara Lawê Delal
- Çele Ber Çela Bilind e
- Gulim Gulbuharim.

Babeta ku wê ji hunermendên din cuda dike, beşdarbûna wê ya bi hunermendên mêr ên Kurdistanê re di stranên duetan de (stranên hevpar) ku bi rastî, bihest, eda, awaz û gotinan dibêje , wê ev serpêhatî bi çend hunermendên kurd re jî pêk anî, wek:

- Zembîl Firoş» û «Seyranê» bi Îsa Berwarî re.
- Ez Keçim, Keça Kurda me» ,«Şivan û Bêrî» û «Were Lawo» bi Semîr Zaxoyî re.
- Xalxalokê » bi Tehsîn Taha re.
- Masî Firoş» bi Fexrî Bamernî re.
- Wî Lolo Delal Lolo» û «Nazdar Çavên Te Derya Ne» bi Ebdullah Zêrîn re.
- Bilbilo Bi Xwîne Buhare » bi Bişar Zaxoyî re.

Her wiha wê bi hunermendên din re jî stran gotine, wek Fûad Ehmed, Mihemed Qedrî, Mihemed Tayîb Tahir û gelekên din.

Heta niha jî hunermendên ciwan ên kurd bi evîn û hewes stranên wê dubare dikin û dibêjin, li gel stranên folklorîk û kevneşopî pêşkêş dikin.

Taybetmendiya herî diyar a navdariya wê lidarxistina konsertên hunerî li derveyî Iraq û Kurdistanê, li welatên Erebî, Ewropî û Emerîkî bû , yek ji van konsertan wê di sala 1973’an de li Lubnanê bi Mihemed Arif Cezrawî, Îsa Berwarî û Seîd Yûsif re pêk anî û Her wiha di navbera salên 1977–1978’an de konserên din li Brîtanya, Fransayê û Awistirya li dar xis, û di sala 1981’an de jî çû Amerîkayê da ku ji bo revenda Kurdî konserên stranbêjiyê pêk bîne.



Gulbuhar di sala 1985’an de dev ji stranbêjiyê berda ,û stran dawî ku pêşkêş kir «Dilo Te Ez Hêlam » ji hêla helbestvan Bedirxan Sindi ve hatibû nivîsandin.

Piştî salên dirêj ên xerîbiyê û dûrketina ji Kurdistanê, ku li paytexta Bexdayê jiyabû, ew vegeriya welatê xwe bi şepêlên bêrîkirin û hesretê , ji bo malbat û hezkirên xwe, ji bo xweza û bedewiya Kurdistanê ku ji wê re mîna rûhekê bû ku gewriya wê ya zelal û dengê wê têr dikir û avdida, bo wê bedewtirîn û baştirîn rewah” eda” bexşîn dikir, ji lewra wê Dihok wek cihê rûniştinê hilbijart.

Piştî rûxana rejîma Bexdayê, tengasiya jiyanê û şert û mercên dijwar ên ewlehiyê, Gulbuhar çend salan çû Urdinê û ligel keça xwe Bêrîvan jiya , paşê di sala 2005’an de vegeriya û li nav gel, cemawer û hezkirên xwe li Dihokê .

Ji bo rêzgirtin û pêzanîna hewildanên wê û terxankirina temenê xwe di xizmeta stranbêjiya resen a kurdî de , Rêveberiya Çandê – Şaxa Dihokê, bi pêşwazî û piştgiriya Wezîrê Çandê yê Herêma Kurdistanê di 17 Adara 2005’an de festîvalek hunerî li Salona Mihemed Arif Cizrawî li dar xist, ji bo nirxandina hunermendan û berhemên wan ên afirîner.

Festîvala du rojan berdewam kir û bi amadebûna wezîrê çandê û kombûneke mezin ji hunermend, stranbêj, nivîskar û hezkirên dengê şîrîn ê Gulbihar beşdar bûn

û di wê festîvalê de strana xwe ya navdar “Ay Dil Dilê Min” pêşkêş kir.

Hunermenda Kurd Gulbuhar, di 23 Sibata 2010ê de, di 78 saliya xwe de, li nexweşxaneyeke Bexdayê, dûrî malbat û mala xwe, koça dawî kir û li gor wesiyeta wê li bajarê “Necef” hat veşartin.

Lê bi mîrateya xwe ya hunerî ya bedew û bi û dengê xwe yê ku hîn jî şadî, evîn û rengên jiyanê li her derê belav dike, di bîranîna gel de nemir dimîne.

Gulbihar ne tenê hunermendek an stranbêjek bû, lê dibistanek hunerî ya yekgirtî ya afirîner û nûjen bû, û gelek hunermendên kurd ji kaniyên wê vexwarine, û stranên wê hîn jî li seranserê Kurdistanê deng vedidin, di xwe de rûhê hunera kurdî ya resen û bîranîna wê ya nemir ji bo nifşan hildigirin.

Bi çûyîna wê re, qada hunera Kurdî yek ji sembolên xwe yên girîng û stûna bingehîn a stran û muzîka Kurdî ya resen winda kir, ew dengê jiyanê bû ku derbirîna hestên gelê kurd, xem û şahiyên wan dikir û dengê wê yê şêrîn di nav awazên xwe de rûhê Kurdistanê û nasnameya wê ya çandî hildigirt.

Gulbihar mîratek hunerî ya dewlemend li dû hişt ku ji zêdetirî 272 stranan pêk tê, ku hîn jî di bîra nifşan de hatine xêzkirin,ev berhem hê jî li pirtûkxaneya hunerî ya kurdî bandor dike û wê bi şaheserên awaz û peyvên wê yên şêrîn xemilandiye.

Gulbahar wê bimîne sembola strana jinên Kurd, û dengekî zindî yê ku di bîra muzîka Kurdî de hatiye xêzkirin û çiraxeke ronî.

Festîvala du rojan berdewam kir û bi amadebûna wezîrê çandê û kombûneke mezin ji hunermend, stranbêj, nivîskar û hezkirên dengê şîrîn ê Gulbihar beşdar bûn

û di wê festîvalê de strana xwe ya navdar “Ay Dil Dilê Min” pêşkêş kir ku rêyên afirînerî û hunerê ji nifşên paşerojê re ronî dike.

Ji rewanê wê yê pak re rûmet û mandarî

Ji mîrateya wê ya hunerî û afrînerî re mayînde û domdarî.

# Mistefa Ehmed: Qutbûna elektrîkê dibe sedema qutbûna avê

Rêveberê Gerenîndeya Avê ya bajarê Dêrikê Mistefa Ehmed diyar kir ku bajarê Dêrikê rastî pirsgirêka qutbûna elektrîkê tê, ev yek dibe sedema qutbûna avê jî, lewma gerenîndeya avê ji bo çareserkirina pirsgirêka avê bernameyek çêkir.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Bajarê Dêrikê û gundewarên girêdayî wê ev nêzî 15 rojan e ku rastî pirsgirêka qutbûna elekitrîkê tê, ev qutbûn bi xwe re gelek pirsgirêkên din jî anîn wek qutbûna avê. Ji ber ku rêjeya germahiyê bilinde û nebûna avê gelek nexweşiyan bi xwe re tîne, lewma Gerenîndeya Avê ya bajarê Dêrikê biryar da bernameyekî ji bo bikaranîna bîrên avê pêkbîne da ku av li ser welatiyên bajêr qut nebe..
Di derbarî rewşa avê li bajarê Dêrikê rêveberê Gerenîndeya Avê ya bajarê Dêrikê Mistefa Ehmed û welatiya bi navê Hêwa Mihemed ji Rojnameya me re axivîn.


Mistefa Ehmed


Hêwa Mihemed

### Gerenîndeya Avê bernameyek nû ji bo bikaranîna bîran çêkir

Mistefa Ehmed da zanîn ku ev demeke bajarê Dêrikê û gundewarên girêdayî wê rastî qutbûna elekitrîkê tên, nebûna elekitrîkê bandorê li rewşa avê jî dike û wiha got: "Me bîrên di bajarê Dêrikê de babeş kirine, hin ji wan li ser elekitrîka giştî kar dikin û hin li ser enerjiya rojê û jînatoran e. Ji roja ku bajar rastî pirsgirêkê qutbûna elekitrîkê hatî em wek gerenîndeya avê me bernameyek xwe çêkir da ku gel nemîne bê av. Di bajarê Dêrikê de 24 bîrên avê hene, ev bîr li ser taxan belavkirîne. 12 berî hene me berî çend salan xeteke taybet a elekitrîkê ji bo wan kişand û niha ew 24 seatan kar dikin, lê di van rojên dawiyê de elekitrîka bajêr seatên dirêj qut dibû, ev bîr jî elekitrîk li ser wan qut dibû. Lewma me hemû jenetor û enerjiyên rojê kirin di bin xizmetê de da ku pirsgirêk zêde nebê. Ji xwe her kes dizane ku di demsala havînê de bikaranîna avê zêde ye."

Ehmed axaftinên xwe wiha domand û got: "Bîrên me yên din ji sibehê heya 5'ê êvarî li ser enerjiya rojê kar dikirin û piştî 5'ê êvarî li ser cenetoran kar dikirin. Lê mixabin em rastî pirsgirêka buhabûn û qutbûna mazotê hatin lewma em neçar man bernameya pêxistina bîrên avê biguherînin. Berî çend rojan Gerenîndeya Avê, Meclis, Şaredarî û Beşê cenetoran, ji bo çareseriyekî ji vê pirsgirêka heyî re bibînin me bernameyek ji bo pêxistina bîran danî. Ku em bîran ji 6'ê sbehê heya 10'ê sbehê pê bixin, ji 12'yê nîvro heya 3'yê nîvro û ji 4 heya 8'ê êvarî ji 9 heya 12'ê şevê bi vî rengê him me torên xwe yên avê jî dagirtin û di heman demê de me hewil da bernameya me ya pêxistina bîran û pêxistina cenetorên taxan bînin nêzî hev."

### 'Pêwîste gel jî xwedî li vê kedê derkeve'

Rêveberê Gerenîndeya Avê ya bajarê Dêrikê Mistefa Ehmed axaftinên xwe wiha qedand: "Di gelek taxan de av hebû lê kêm bû, bi taybet kesên ku malên wan li qatên bilind pêwîst bû dînemoyan pêbixin heya ku av bighêje wan, ji ber vê yekê ev bername guncaw bû. Lê tevî hemû rewşa heyî jî me hemû hewildanên xwe kirin ku bajarê Dêrikê wek wan bajarên din rastî pirsgirêkên mezintir neyê. Di heman demê de mirab bi me re alîkare dema hin kes bê av maban tankên avê diçe ava wan dadigire. Em hertim amadene ji rewşên awarte re, çi bersgirêkên ku derdikevin jî li gor derfetên ku di nav destên me de heyî em hewil didin çareser bikin, da ku pirsgirîkên avê mezintir nebin. Dema ku torên avê bimînin bê av çareserî dom dike pêwîstî bi elekitrîka giştî çêdibe heya ku ew pirsgirêk were çareser kirin. Em bi hêvîne ku gel xwedî li vê kedê derkeve, ji ber ku em kedê didin ji bo wan pêwîste ew jî qedir bidin vê yekê, da ku ev av têra herkesî hebe."

### 'Qutbûna avê nexweşiyan bi xwe re tîne'

Welatiya bi navê Hêwa Mihemed anî ziman ku ev nêzî 15 rojan bû ew rastî pirsgirêka qutbûna avê dihatin û wiha got: "Piştî ku elekitrîk di bajar de qut bû em rastî pirsgirêka qutbûna avê jî hatin, ji ber ku mala me qata duyeme av kêm dihat û nediga qazanên me. Niha em di havînê de ne mirov ji hemû demsalan zêdetir hewcedarî avê ye ji ber ku nebûna avê gelek nexweşiyan bixwe re tîne. Lê em spasiya Gerenîndeya Avê dikin ji ber ku rê li pêşiya van nexweşiyan girt û bernameyek guncaw ji bo bajêr çêkir, niha dema cenetorê taxê pêdikeve em ava xwe jî dadigirin. Em bihêvîne pirsgirêka elekitrîkê jî çareser bibe."

# Ajokar ji bilindbûna buhayê sotemeniyê ne razî ne

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Ajokarên erebeyên xetên hundirîn ên veguhestinê yên Kornîş û Hilêliyê destnîşan kirin ku nirxê benzînê zêdetirî du qatan zêde bûye, lewma wan jî buhayê kirêya veguhestinê bilind kirine û gotin, "Yên herî zêde zerarê dibînin welatî ne."**

Ev bûye demek ku herêma Cizîrê kirîza sotemeniyê dijî, ku ev krîz bandor li ser hemû warên jiyanî kiriye ji warê veguhestinê destpêkirye û gihaştiye elktirîk, av, paqijiya giştî û hilberînan nan. Encamên vê krîzê bandor li ser buhayên hemû pêwistiyan kiriye û bare welatiyan girantir kiriye..
Piştî diyarkirina nirxê lîterya mazotê bi 75 sentan û benzîn bi 55 sentan, ev bilindbûn bandor li ser jiyana rojane ya welatiyan kiriye, ji ber ku piraniya waran xwedispêrin mazot û banzînê. Wezareta Enerjiyê kêmbûna nirxê benzîn, mazot û xaza navmalî û pîşesazî raghand, ev jî di demekê de ku li şûna buhayê dolar ya Sûriyê bikar bînin. Li gorî buhayê nû rêjeya sotemniyê bi giştî gihaşt di navbera ji sedî 15,37 û ji sedî 20,39. Lê ev nebû sedema başbûna di sektora veguhestinê û warên jiyanî yên din, ji ber kêmbûna sarîcên ku ji bo herêma Cizîrê hatiye diyarkirin, li gorî ajokaran ew bi demên dirêj li cihê sotemniyên dimînin heya kubenzînan mazotê bi dest dixin herwiha ji ber kêmbûna wê dibe ku neghêje her kesî lewma ajokar neçar dimînin ku ji bazara serbest bikirin.

### Sektora veguhestinê ya herî zêde bandordar bûye

Sektora ku herî bandor ji vê kirîzê dîtiye ya veguhestinê ye, çi di navbera bajaran de an jî veguhestina di nava bajaran de. Ajokarên ku li ser xeta Kornîş, Hilêliyê, Enteriyê, Keracat û Qenat Siwês nirxê veguhestinê ji 3 hezaran kirine 5 hezarên lîreya Sûriyê, tevî nebûna biryarek fermê ya nû ji bo diyarkirina nirxê veguhestinê.
Derbarê vê mijarê berpirsê xeta Kornîşa Mihemed El-Elî diyar kir ku berê ajokaran 75 lîtrebenzînbi 35 hezarên lîreya Sûriyê dikrîn, lê niha bi 600 hezarên lîreya Sûriyê dikrin û domand: "Tevî ku buhayê veguhestinê bûye 5 hezar jî lê têrê nake, ev yek bandorê li ser welatiyan jî dike û ajokaran. Berê bi buhayê veguhestinê bi 2 hezaran bû, ev buha têrî ajokaran dikir, lê niha çiqasî buhayê zêde bikin dê weke xwe bimîne, ji ber ku hemû pêwistiyên veguhestinê û erebeyan jî buha buye ji zeytê bigire heya perçeyên erebeyan. Em bi hêvî ne ku çareseriyeke ji vê kirîzê re bê dayîn û alîkariya ajkoaran bê kirin, bi vê yekê wê barê welatiyan jî sivik bibe, ji ber ku piraniya karmend û xebatkaran di çûna karên xwe de xwe dispêrin wesayîtên veguhestin."


Mihemed El-Elî


Ehmed El-Akûb


Seyfedîn Mihemed

### Buhayê benzînê zêdetirî du qatan bilind bûye

Ajokarê bi navê Ehmed El-Akûb jî destnîşan kir ku bilindbûna bihabûna sotemeniyê tu carî nakeve xizmeta gel de û wiha got: "Berê me her şeş rojan 75 lître benzîn bi 35 hezaran dikrî, lê niha bûye her heşt rojan karteke tam bi 600 hezar lîreyên Sûriyê ye. Cudahiyeke pir mezin heye û em pir êşan û zehmetiyan dikşînin. Ji ber bihabûna nirxêbenzînme bi xwe kirya veguhestinê bilind kir, ji ber ku nema têrî me dikir."
Ajkoar di axaftinên xwe de bal kişan li ser astengiyê li bendewariya bidestxistina banîzê jî kir û wiha berdewam kir: "Ez duh ji seat 8'ê Sibehê heya 3'ê nîvor li benda dewra xwe mame ji bo bidestxistina benzînê ji benzînxaneyê ."
Di dawî de ajokarê bi navê Ehmed El-Akûb daxwaz kir ku nirxê benzîn veger wekî mîna berê û eger hezarekî jî zêde bikin tu pirsgirêka wan nîne, lê buhayê di dema heyî de pir zirarê dihîne wan.

### Banîzn pir kêm bûye

Ajorakê li ser xeta Hilêliyê Seyfedîn Mihemed jî nerazîbûna xwe derbarê vê buhayê û kirîzê anî ziman û wiha got: "Heman banzîna ku me bi 35 hezaran kirî îro bûye zêdetorî 10 qatan. Benzîn pir kêmbûye, ev îro çar roj karta min bi dawî bûye lê benzîn tune ye, ji bilî li bendemayîna li pêşiya stasyonan. Ev îro sê roj ajokar li pêşiya stasyona Cûdî û Cermoklî ne lê tune ye."
Seyfedîn Mihemed daxwaza vegerîna buhaya berê kir û destnîşan kir ku ji ber vê buhayê jî tevgera welatiyan a çûn û hatinê jî kêm bûye û wiha bidawî kir: "Ji ber buhabûnê gelek welatî êdî bi meşê an biskiltan diçin û tên. Kesên ku gelekî neçar nemîne wesayîtan bikar naynin, ji ber milet jê pir xizane û her kes nikare her roj van buhayan li kiriya veguhestinê bide. Milet yê herî ku zirar dihêjê ji ber ku bi çi awayî em dimeşînin."

### Nerazîbûna gel li hemberî van buhayan

Ji xwe gel jî nema van buhayan qebpl dike û her roj bi rêya protesoyan li çend bajarên herêma Cizîrê nerazîbûnên xwe anîn ziman, ji ber hem rewşa aborî ya zehmet hem jî ji ber bandora guhertina nirxê sotmemniyê li ser hemû warên jiyanî, bilindbûna nirxê elktrîkê û hilwişêna aboriyê.
Gelek şênî dibînin ku her çaksazkirineke aborî divê li rewşa aborî ya welatiyan û şiyana wan ya kirînê bigrin dest, digel başkirina mûçeyan, piştgiriya sektorên hilberînê û dabînkirina xizmetguzariyên bingehîn, ji ber ku ev gav hemû bi hev re girêdayî ne û nabe ji hev bê veqetandin. Herwiha gelek kes jî destnîşan dikin ku mijar ne tenê guhertina di buhayan de ye, lê hewcdariya siyasetek berfrehetir heye ku karîbe pirsgirêkê ji kokê çareser bike û rasterast li ser jiyan welatyan ya rojane nîşan bide.



# Ji merasîma çekşewitandinê heta niha çi gav hatin avêtin?

Pêvajoya "Aştî û Civaka Demokratîk" ku bi banga Rêber Apo dest pê kir, piştî merasîma çekşewitandinê ya dîrokî, bi gavên siyasî yên nû berdewam kir. Ji avakirina komîsyonê heta vekişandina hêzên Tevgera Azadiyê ji sînorên Bakur û nîqaşên li ser qanûna çarçoveyî, gelek pêşketin çêbûn. Ji merasîma çekşewitandinê heta niha çi gav hatine avêtin?

**Amara Baran**

Tevgera azadiyê li ser Banga Rêber Abdullah Ocelan, di 11'ê Tîrmeha 2025'an de. Bi pêşengtiya Hevseroka KCK' ê Besê Hozat û bi beşdarbûna 30 Gerilayan, bi îradeya xwe ya azad, li Şikefta Cesenê merasîma çek şewitandinê hat li darxistin. Siyasetmedar, rewşenbîr, rojnameger, nivîskar, Dayikên Aştiyê û endam û rêveberên saziyên sivîl jî di merasîma çek şewitandinê de amade bûn.




### Banga Rêber Abdullah Ocalan û gavên dîrokî

Dewleta Bahçelî ku tevahiya emrê xwe bi dijminatiya Kurdan derbas kiriye, dest dirêj kirina wî di nav civakê de bi matmayî hat pêşwazîkirin. Rêber Abdullah Ocalan têkildarî gavên Devlet Bahçelî de wiha got: "Tecrîd berdewam dike. Heke şert û merc ava bibin, hêza min heye ku ez pêvajoyê ji zemîna şer û pevçûnê veguherînim ser bingeha hiqûq û siyasetê. Ez xwedî vê hêza teorî û pratîk im. Rêber Abdullah Ocalan ji bo pêşî li pêvajoyê veke di 27ê Sibata 2025'an de "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" kir û di banga xwe de ji PKK xwest kongreya xwe pêk bîne, dest ji têkoşîna çekdarî berde, xwe fesix bike.
Li ser bangê,PKK'ê di navbera 5-7ê Gulanê li Qadên Parastina Medyayê li du herêmên cuda, bi tevlibûna 232 delegeyên ve Kongreya xwe ya 12'emîn li dar xist û biryara xwefesixkirinê girt. Ev biryar ji bo avakirina derfetên aştiyê neteweyî û navneteweyî wek geşedaneke dîrokî û fersendeke mezin hat nirxandin. Gelek dewlet li pey hev peyamên piştgiriyê dan û xwestin Tirkiye van derfetan ji bo çareseriyê baş binirxîne.

### Banga Rêber Abdullah Ocalan ya bi dîmen û kelecana gel

Piştê 26 salan Rêber Abdullah Ocelan cara yekem di 9'ê Tîrmeha 2025'an de bi dîmen peyam da. Û di peyamê de wiha got: "Ez banga xwe ya Aştî û Civaka Demokratîk hêj diparêzim" da. Ev banga bi Dîmen ji heft heta heftê salî dengvedanek da çêkirin. xwedî derketineke xort ji aliyê gel ve hat çêkirin. Peyamên Rêber Abdullah Ocalan hem li rojhilata navîn hem navneteweyî de bi kelêcaneke mezin ve hatin pêşwazîkirin. Li çar aliyê kurdistanê gel xwedî li banga Rêber Abdullah Ocelan derket.

### Koma aştî û civaka demokratîk: Şewitandina çekan

Di cîhanê de gelek hêzan ji bo rawestandina şer û ji bo ku pêşî li komkujiyan bê girtin demki be jî çekan dane rawestandin. Lê di dirokê de cara yekeme ku hêzeke bi îradeya xwe ya azad çekên xwe îmha dike. Piştê banga 27'ê Sibatê û 9'ê Tîrmehê a Rêber Abdullah Ocelan. Di 11'ê Tîrmehê de, Koma Gerîla ya bi navê "koma aşitî û civaka Demokratîk" ku ji 30 Gerîlayê 15 jin û 15 mêr pêk dihat çeken xwe şewitandin. Heman demê de ji bo ku bersivê bidin banga Rêber Apo Koma Aştî û Civaka Demokratîk di merasîmê de ragihand ku "Ji niha û pê ve, em bi vîna xwe ya azad çekên xwe ji holê radikin, bi armanca domandina têkoşîna xwe ya ji bo azadî, demokrasiyê û sosyalîzmê bi rêya siyaseteke demokratîk û rêbazên yasayî, û li ser bingeha derxistina yasayan ji bo entegrasyona demokratîk. pêk werin pêdivî bi qanûnan heye."bi vî daxuyaniyê, ji tevahiya cîhanê re aşkere kirin ne bi tekoşîna çekdarî bi tekoşîna siyaseta demokratîk û hiqûqê esas digre.

### Şikefta Cesena: Di bîra civakê de zindî hat hêştin

Cîhê ku ji aliyê koma aşitîtî û civaka demokratîk ve hatibû hilbijartin pir watedare. Şikefta Casenê ya gundê Surdaş a Dukanê ya bi ser Silêmaniyeyê, di dîroka kurdan de xwedî girîngiyekê mezine. Piştê Şerê cihanê ê yekem kurdistan parçebû û hebûna gelê kurd hat înkarkirin hemû hêzên heremî û navnetewî li dijî daxwazên gelê kurd derketin. Gelê kurd li li dijî înkar û metîngeriya ku li ser wan hatibû ferzkirin berxwedaneke mezin nişanda û ji bo azadî û nasnameya xwe berdelên giran dan. Di nav şert û mercên herê sînordar de gelê kurd hewilda çalakiyên çandî û ronakbirî jî pêş bixin yek ji wan gavên dîrokî jî derxistina rojnameya kurdiye ku şikefte cesanê jêre şahîdî kiriye ew herem di dema serhildana şex Mehêmûd Berzencî de xizmetekî girîng dike, Şikefta Casenê wek baregehekî ji aliyê şervana ve hatiye bikaranîn. Ji ber wî jî, ji aliyê tevgera azadiyê ve hat hilbijartin. Şikefta Casenê di dîroka gelê Kurd de hat zindîkirin.

### Xebata stratejîk a Komisyonê

Piştî biryar fesixê û şewitandina çekan. Di 5'ê Tebaxa 2025'an de ji xeynî ÎYÎ Partiyê partiyên ku komên wan di Meclisê de hene Komîsyona Meclisê ava kirin. Komîsyon di civîna xwe ya ewilê de navê "Komîsyona hevgirtina Netewî , Xwişk-Biratî û Demokrasiyê" li xwe kir û li ser 12 xalên bingeha xebata xwe diyar dike, li hev kir. Ev yek ji bo pêvajoyê wek qonaxeke qanûnî hat diyarkirin û civakê bi rêjeyeke mezin piştgirî da pêvajoyê. Komîsyona piştî civîna ewil wezîrên parastin, karên hundirîn û sîxurtiyê guhdar kir bi dorê sazî û dezgehên malbatên leşker û polîsên di pêvajoya şer de jiyana xwe ji dest dane, saziyên pîşesaziyê, saziyên bazirganan, Dayikên Aştiyê, saziyên malbatên gerîlayên di pêvajoya şer de jiyana xwe ji dest dane, saziyên girtî û hikûmxwaran, saziyên çand û ziman, akademîsyen, saziyên sivîl ên civakî, hunermend û gelek derdorên cuda yên ji ber şer û pevçûnan mexdur bûne û çavdêriyên wan çêbûne guhdar kir.

### Tevgera azadiyê xwe ji sînorê Bakur vekişand

Tevgera azadiyê ji bo pêk anîna aştiyê gelek gavên dîrokî avêtin. herê dawîyê jî di 26 Cotmehê de bi daxuyaniyek li Qendîlê ragihandin ku xwe jî sînorên Bakûr vekişandin e. Ev daxuyaniya tevgerê di raya giştî de dengvedanek da çêkirin.

### Komisyon çû Îmraliyê ye

Hevseroka Partiya DEMê Tülay Hatimoğulları ragihand ku eger komîsyoneke parlamentoyê serdana Rêber Abdullah Ocelan bike, ew ê pêvajoyeke danûstandinên demokratîk bide destpêkirin. Li ser wî pêşniyarê gelek nîqaş hatin meşandin. Komîsyonê di civîna xwe ya 18'emîn a ku di 21ê Mijdarê de hat lidarxistin de, bi piraniya dengan biryar da ku guh bide Rêber Abdullah Oelan. Di dengdana nav komîsyonê de, AKP, MHP, Partiya DEMê, TÎP û EMEP dengê erênî dan, lê Partiya Yeni Yolê bêalî ma. Partiya Demokrat, HÜDA-PAR û Partiya Çep a Demokrat li dijî pêşniyarê deng dan. CHP û Partiya Refaha Nû (Yeniden Refah Partisi) beşdarî dengdanê nebûn. Li gorî vê biryarê, heyetek ku ji Gülistan Kılıç Koçyiğit (Partiya DEMê), Feti Yıldız (MHP) û Hüseyin Yayman (AKP) pêk dihat, di 24'ê Mijdara 2025an de çû Îmraliyê û bi Abdullah Öcalan re hevdîtin pêk anî. Lêbelê, CHPê ji bo heyeta ku serdana Îmraliyê dikir, tu endam destnîşan nekir. Ev helwesta CHPê bû sedema rexneyên tund û partî bi dijberiya pêvajoya çareseriyê.

### Nexşerêya Bahçelî

Di nav nîqaşên li ser rewşa xitimandina pêvajoyê de, Devlet Bahçelî di 18 ê Gulanê de diyar kir ku gaveke nû hewce ye û "nexşeyek rê" pêşkêş kir ku ji heft xalan pêk tê. Bahçelî rola "Koordînatorê Pêvajoya Aştiyê û Siyasetkirinê" ji bo statuya Rêber Abdullah Ocelan pêşniyar kir û got, "Koordînator dê Rêber Abdullah Ocelan, serokê damezrîner ê PKKê be." Bahçelî her wiha ragihand ku dê du komîsyonên cuda - yek di nav şaxa qanûndanînê de û yek jî di nav şaxa rêveberiyê de ji bo şopandina pêvajoyê werin damezrandin.

### Kilîta çareseriyê Îmraliyê ye

Tevgera Azadiyê û Rêveberên tevgerê nerazîbûnên xwe li dijî qanûna çarçoveyî nîşan daye, Dewlet pêvajoyê dixwaze pêvajoyê wekî "teslîmbûn"ê digre dest. Di 23ê Hezîranê de, Endamê Akademiya Zanistên Civakî ya Rêber Abdullah Ocelan, Duran Kalkan got, "Me got ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo mifteya her tiştî ye; dê ji wir ve mifte were vekirin."
Di heman demê de di 2'ê Tîrmehê de, Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCKê derbarê nîqaşên li ser qanûna çarçoveyî de daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Eger bi Rêbertî re hevdîtin û nîqaş neyê kirin, nêrîna tevgera me neyê girtin û li ser vê yekê bê gotin ku wê qanûneke bi filan rengî bê derxistin, di naveroka xwe de wê filan filan tişt hebin; ev yek wê weke lîstikekê, weke ferzkirinê, her wiha weke komployekê bê dîtin. Ne Rêber Apo ne jî Tevgera me ya Azadiyê "emrîwaqiyekê" qebûl dike. Bi gotina 'Me qanûn derxist, qebûl nakin' nirxandin û ferzkirina polîtîkaya şerê taybet, wê bibe nêzîkatiyeke dûrî aqil."

### Mafê hêviyê

Niha mijarên ku herê zêde dibin rojev û li ser tê nîqaşkirin mafê hêviyê û derxistina qanûna ye. Her çiqas ji aliyê desthilatdariyê ve, daxuyaniyên erênî hatine dayîn jî, lê di piratîkê de gavên berbiçav nehatine avêtin. Ew jî dihêle ku di nav civakê de nîqaşên bê baweriyê derkevin holê. Ev nêzê du mehên ku hevdîtin bi Rêber Abdullah Ocelan re nehatiye çêkirin. Rêber Abdullah Ocelan aktorê bingehîn ê pêvajoya aştî û civaka demokratîk e. tişta ku rê li pêşiya hevdîtinan digre, astengiya herê mezin ya li pêşiya pêvajoyê ye. Belê her çiqas astengî hebin jî Reber Abdullah Ocelan di meşandin û serxistina pêvajoyê de bi israre. Pêvajoya ku bi pêşengtiya Rêber Abdullah Ocelan ve hatiye dest pê kirin li Rojhilata Navîn rê li pêşiya zemîneke nû ya nîqaşên siyasî vekiriye. Bi dest pê kirna pêvajoyê re çek rawestiyan nîqaşên aştiyê derketin holê. Dewleta Tirk li bende ye tevgera azadiyê bê ku qanûn derbikevin biçe teslîm bibin.

# Desthilatdariya Sûriyê aboriya xwe xurt dike û gel birçî dihêle

**Hikumeta demkî ya Sûriyê li ser terzê rêjîma Baas îro bi rêya peymanên gaz û petrolê hebûna xwe ya siyasî herwiha qada aborî xurt dike û gelên Sûriyê birçî dihêle. Rûsya, dewleta Tirk, Îmarat û DYA kompanyên xwe li Sûriyê kirine dewreyê, pirs ew e gelo wê ev projeyên aborî bikevin xizmeta gel an hêzên hegemon û desthilatdariya Sûriyê?**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Ji Rimêlan heya Dêrazorê, Berava Sûriyê, Heleb, Idlib û Şamê projeyên aborî bi serweriya hikumeta Sûriyê û bi destwerdana kompaniyên biyanî hatine destpêkirin, projeyên aborî derbarê petrol û madeyên sotemeniyê ne. Ev bazar û peymanên aborî di demekê de pêktên ku gel li tevahiya Sûriyê di qeyraneke elektrîk, mazot û dahatên jiyanî de dijî.

### Tirkiyê pêşenga welatên ku cihê xwe di projeyê de digirin

Piştî êrîşên komkujiyên li herêmên Beravê Sûriyê, niha têkoşîneke mezin a enerjiyê diqewime. Peymanên hatine çêkirin eşkere dikin ku kîjan dewlet xazê li Beravê distînin. Berê hatibû eşkerekirin ku Rêxistina Îstîxbarata Neteweyî ya Tirkiyeyê (MÎT) ku di komkujiya zêdetirî hezar sivîlên Elewî li bajarên Beravê yên wekî Lazkiyê, Tartûs û Cebleyê de rolek lîstiye, bi zêdekirina tevgerên xwe yên îstîxbaratî li herêmê bingeha stratejiyeke demdirêj daniye û bi rêya çeteyên radîkal ên ku ji Îdlibê veguheztine deverên Beravê, êrîşên komkujiyê yên nû plan dike. Niha hatiye zanîn ku dewleta Tirk hebûna xwe ya leşkerî û îstîxbaratî li herêmê xurt dike, bi rêya kompaniyan jî li dû parek mezin ji gaza herêmê ye. Li gorî agahiyên ku ji çavkaniyên pêbawer ên Malpera Lêkolîn hatine wergirtin, kompaniya Tirkî Limak û kompaniya Sûrî Phoenix li Girava Arwad û derdora wê ku bi qasî 3 km dûrî Berava Tartûs, Sûriyê ye, projeyek derxistina gazê dane destpêkirin. Hat diyarkirin ku proje plan dike binesaziya gazê ya nûjen di bin navê saziyên geştiyariyê de bi şêwaza mîmariya kevn a Erebî were avakirin.

Di prosesa firotina gaza Sûriyê bi taybet a li Berava Sûriyê gelek kompanî hene, ji yên Amerîkî bigire heya Rûsî û Tirkî, Îmaratî û hwd… Ji wan Kompaniya Limak a Tirkiyê, Kompaniya Fenike ya Sûriyê, El-Hayat International a Îmarat, Chevron ya DYA û Rabit et-Teknik a Rûsya (Kompaniya Rûsî dê boriyê deyne) ye. Li gorî peymana destpêkê ya heyî, belavkirina parkirinê wiha ye: Tirkiye: %30, Rûsya: %30, DYA û welatên Kendavê: %30, Sûriye: %10 Di demekê de ku hikûmeta demkî ya Şamê rezervên gazê yên li herêma peravê dide dewletên din, ew alî ye ku para herî kêm a çavkaniyên gazê di avên xwe yên herêmî de werdigire. Rezervên dewlemend ên gazê û cihê jeostratejîk ê perava Sûriyeyê vê pêşbaziya dijwar rave dikin. Me destnîşan kir ku di navbera Emîrtiyên Erebî yên Yekbûyî û Tirkiyeyê de ji bo projeyên aborî û enerjiyê li perava Sûriyeyê, bi taybetî di demên dawî de, pêşbaziyek eşkere heye. Herwiha hate zanîn ku di çarçoveya projeyê de, şîrketa Rûsî dê ji Girava Arwad heta Tartusê boriyek gazê deyne û Chevron, digel hevkarên xwe yên Kendavê, dê mafê hilberîna mîqdarek girîng a gazê bi dest bixe.

### Hikumeta demkî li ser terzê rêjîma Baas berhemên Sûriyê difiroşe!

Beşdarbûna Îran û Rûsyayê di warê aboriya Sûriyê de armanc jê ew bû ku piştgiriya rêjîma Baas bikin. Moskowê îmtiyazên mezin ji Şamê bi dest xistin berî ku rêjîm têkbiçe, di heman demê de Tehran ji hêla gelek faktoran ve hatibû astengkirin, ew bi keyfa xwe tevnedigeriya ji ber ku gendeliya di nava saziyên hikumeta berê ya Sûriyê de, hem jî astengiyên burokrasiyê, pêşbaziya bi aktorên herêmî û Rûsyayê re û danîna cezayên Qeyser li ser rêjîma Baas û piştgira wê Îran. Rûsya di lûtkeya destwerdana xwe ya leşkerî ya sala 2015'an de, IHS Jane's ku saziyeke Birîtanî ye da zanîn ku lêçûna destwerdana Rûsyayê di navbera 2.4 û 4 milyon dolar de ye di rojê de û lêçûnên giştî yên Rûsyayê ji Îlona 2015'an heya 2019'an tenê digihîne navbera 2.5 û 4.5 milyar dolarî. Di heman demê de Wezareta Derve ya Dewletên Yekbûyî texmîn kir ku Îranê ji sala 2012'an heya 2019'an ve zêdetirî 16 milyar dolar li Sûriyê xerc kiriye. Li gorî Elî Ekber Welayetî, şêwirmendê bilind ê Rêberê Bilind ê Îranê di karûbarên navneteweyî de, hat diyarkirin ku Tehran salane 8 milyar dolar dida ji bo berdewamiya hikumê rejîma Baas. Lewma jî Îranê bi deh hezaran çekdar li Sûriyê bi cih kiribûn û cebilxane şandibû, berhemên petrolê yên Sûriyê peyda dikir û bi kar tanî. Rast e Rûsya û Îran piştgirî didan rêjîma Baas, lê wan ev piştgirî weke xalên ji bo destnîşankirina qadên bandora xwe li ser qadên cuda didan pêkanîn, hem jî hewldana misogerkirina berjewendiyên xwe yên demdirêj li Sûriyê didîtin. Lê belê ev têkiliya tevlîhev di derbarê jinûveavakirin û derfetên veberhênanê de her ku diçû aloztir dibû. Sedem jî ew bû ku rêjîma Baasê pêvajoyên vejîna aborî û peymanên ku îmze dikirin ya duyem, kompaniyên Îranî û Rûsî nedixwestin di warê aboriya Sûriyê de istismarê bikin, sedem jî xetereyên mezin ên ewlehî û darayî yên heyî bû. Di Çileya 2017'an de, hikumetên Sûriyê ya têkçûyî û Îranê lihevkirineke aborî îmze kirin armanc jê ew bû ku mafê Îranê heye fosfatê ji zeviya Şerqiya ya nêzîkî Tedmurê di nav xwe de digirt derxîne. Lê belê piştî şeş mehan bi şûn de rêjîma Baas peymanek taybet da Stroytransgaz bi kompaniya taybet a Rûsî îmze kir da ku salane 2.2 mîlyon ton fosfat ji heman madenê ji bo 50 salan derxîne û bifroşe û ji sedî 30 dahatê ji dewleta Sûriyê re were veqetandin. Piştî hilweşîna rêjîma Baas tevahiya gelên Sûriyê hêvî dikirin ku ew warê aborî û hemû qadên din bi rê ve bibin, aboriya xwe xurt bikin, kompaniyên xwe ava bikin û li pêş bixin da ku rêjeya bêkariyê nemîne û bikaribin bi rûmetdarî bijîn. Lê hişmendiya kes û hikumeta ku hatiye ser desthilata Sûriyê ya demkî xewnên gelên Sûriyê yên bi ronî veguherandin kabûsên tarî. Siyaseta hikumeta demkî wiha ye, mîna siyaseta rêjîma Baas e, siyaseta rêjîma Baas wiha bû ku aboriya xwe radestî hêzên Rûsî û Îranî dikir da ku hebûna xwe ya siyasî berdewam bike, wê gelên Sûriyê di rêjeya herî kêm a belengaziyê de dihişt û hikumeta xwe bi hêz dikir. Em îro li rewşa gelên Sûriyê binêrin û binirxînin em ê bibêjin ku rewşa gel ya di serdema rêjîma Baas tevî hebûna Cezayên Qeyserê jî ji serdema îro çêtir e, sedem jî hegemoniya desthilata nû ya aborî ye, hikumeteke ku diranê xwe li goştê laş gelên Sûriyê tûj kiriye û dixwaze xwîna wan vexwe, çi bi riya polîtîkayên qirj ji bi fetisandina aborî ew dixwaze xwe li ser hesabê gelên Sûriyê bi hêz bike.

### Dê projeyên aborî û enerjiyê bikevin xizmeta gel?

Di dema dawî de Sûriyê bûye qada pêşbaziya enerjiyê, petrol û gaz amûra vê pêşbaziyê ye û ev yek bûye sedem ku gelek hêzên herêmî û navneteweyî hewl bidin cihê xwe di projeyên enerjiyê de misoger bikin. Di vê çarçoveyê de, Tirkiye, Rûsya, Dewletên Yekbûyî û hin welatên Kendavê bi awayên cuda dixebitin ku di pêvajoya derxistina çavkaniyên enerjiyê de rolek mezin bistînin. Ji aliyê siyasî ve, ev pêşbaziya aborî bi gelek pirsên girîng ve girêdayî ye. Yek ji wan ew e ku gelo hikumeta demkî ya Sûriyê dikare berjewendiyên gelan biparêze an jî ji bo desthilata xwe dixebite û beşeke mezin ji çavkaniyên Sûriyê radestî kompanî û dewletên biyanî bike. Gelek alî vê yekê rexne dikin û tekez dikin ku para Sûriye ji van projeyan werdigire gelekî kêm e ev yek jî dihêle nerazîbûna gel û qada siyasî derkeve pêş. Destwerdan û serweriya hêzên desthilatdar weke Tirkiyê, Rûsya, Emîrat û Dewletên Yekbûyî ne tenê li ser warê aborî, ew di warê hebûna xwe û tevgera xwe ya jeopolîtîk li Rojhilata Navîn de misoger dikin. Her aliyek hewl dide ku bi rêya projeyên binesazî û peymanên aborî cihê xwe di siberoja siyasî ya Sûriyê de bihêz bike. Ji bo gelê Sûriyê, pirsê bingehîn ew e ku gelo ev proje dê bibin destek ji wan re, ew ê vejîna aborî û afirandina derfetên kar bi xwe re bînin, an jî wê tenê berjewendiyên Sûriyê û dewletên biyanî de biparêzin.





# Zihniyeta nijadperest gefa li ser civaka pirçandî ye

**Civaka pirçandî modelekî civakî ye ku tê de komên xwedî ol, ziman, netew, çand, bîr û baweriyên cuda di nav heman sîstema siyasî û hiqûqî de bi hev re jiyan dikin, lê bi serdema kapîtalîzim û pêşketina zihniyeta nijadperestiyê re, gefên li ser vê modelê zêde dibin.**

**Aryen Hesen**

Civaka pirçandî ku dewlemendiya çanda tevilhev ya huner, xwarin, muzîk û wêjey, çandên cuda, jiyana civakî geş û rengîn dike. Dema ku hemû kom hîs bikin mafên wan tê parastin, şerê navxweyî û pevçûnên etnîkî kêm dibin, di heman demê de aştî û îstîqrar pêkan dibe. Afirînerî û pêşkeftina nêrînên cuda yên li ser pirsgirêkan, rê li ber çareseriyên nûjen û afirîner vedikin. Lê belê li beramberî modêla civaka pirçandî zihniyata nijandperest û neqbûlkirina etnîkî pêş dikeve ku armanca wê ruxandina sîstema pirçandiya civakî ye û avakirina civkeke yek rengî ye, ev zihniyet jî jiyana pirçandiya civakî dixwe nava gefê.



### Civaka pirçandî

Civaka pirçandî modelekî civakê ye ku tê de komên xwedî ol, ziman, netew, çand, bîr û baweriyên cuda di nav heman sîstema siyasî û hiqûqî de bi hev re dijîn. Di vê civakê de yek çand li ser çandên din nayê ferzkirin, berovajî vê tiştên cuda wekî dewlemendiyekê tên dîtin û parastin. Civaka pirçandî nîşaneya jiyana komînale, ku di navbera gelek netew û pêkhateyan de ye. Her yek ji wan li gorî kevneşopî û çanda xwe dimeşe û rêzdariyê ji çandên dîtir re dike, di heman demê de bi hevre cejnên hevdu pîroz dikin. Jiyana pirçandî di nava xwe de hemû cûreyan digire û wan hembêz dike, civaka pirrengî dibe nimûneya aştî û wekehviyê ku hemû bi hevre di nava civakekê de jiyan dikin û daxwaza jiyanek bi ewle û aştiyane dikin.

### Taybetmendiyên sereke yên Civaka pirçandî

Parastina siyasî û hiqûqî: Sîstema dewletê an rêveberiyê mafên hemû koman (kêmnetewe an piranî) bi qanûnan diparêze.

Xwerêveberî û beşdarbûn: Hemû komên cuda dikarin di biryarên siyasî de cih bigirin û nûnerên xwe hilbijêrin.

Rêzgirtin: Di navbera koman de qebûlkirin heye, her kes rêzê li şêwaza jiyan û baweriya yê din digire.

Parastina ziman û çandê: Mafê her komekê heye ku bi zimanê xwe perwerdehiyê bibîne, olê xwe bijî û cejnên xwe pîroz bike.

### Nimûneyên jiyana pirçandî li cîhanê

Kanada û Siwîsra: Ev her du dewlet di asta cîhanî de wekî modelên herî serkeftî yên pirçandiyê tên naskirin. Li Swîsreyê 4 zimanên fermî hene û çandên cuda bi ahengî dijî.

Afrîkya Başûr: Weke "Welatê Rainbow" (Neteweya Keskesor) tê naskirin ji ber ku bi dehan komên etnîsîteyên cuda û 11 zimanên fermî yên cuda hene, di nava aştî û hevbeşiyê de lê dijîn.

Awistralya: Civaka wê ji zêdetirî 200 hawirdorên çandî û zimanî yên cuda pêk tê. Dewlet polîtîkayên taybet ji bo parastina çanda welatiyên resen û çanda koçberan dimeşîne.

Sîngapûr: Welatekî piçûk e, lê çar komên çandî yên mezin (çînî, malayî, hindî û ewropî) bi parastina cejn, ziman û olên xwe re di nav hevsengiyeke mezin de bi hev re dijîn.

### Gelê Kurd di nava xwe de hemû netew û pêkhateyan hembêz dike

Li Başûrê Kurdistanê: Kurd, Tirkmen, Aşûrî, Kildan, Ermen û Ereb bi hev re dijîn. Herwiha di nava xwe de gelek olên weke; Misilman, xiristiyan, Êzidî, Kakeyî (Yarsan), Zerdeştî û Cihûyên digire. Li Wezareta Awqaf û Karûbarên Olî, nûnertiya 8 ol û baweriyên cuda bi fermî heye.

Li Bakurê Kurdistanê: Tevî polîtîkayên asimilasyonê yên dîrokî jî, civak bi xwezayî pirçandîbûna xwe parastiye. Mêrdîn sembola herî mezin a jiyana pirçandî ye. Kurd, Ereb, Tirk û Suryanî bi sedsalan e, li heman taxan cîrantiyê dikin. Dengê azanê û zengila dêrê li vî bajarî tevlî hev dibin.

Li Rojhilatê Kurdistanê: Li bajar û deşta Urmiyeyê mînakeke pir rengî gelekin. Kurd (bi zaravayên kurmancî û soranî), Azerî (tirk), Aşûrî û Ermen bi sedsalan e bi hev re di nav peywendiyên aborî û civakî de ne, herwiha di nava xwe de bawariyên cuda digirin.

Li Rojavayê Kurdistanê: Pergala Rêveberiya Xweser a ku li vî parçeyî ava bûye, li ser bingeha felsefeya "Neteweya Demokratîk" pirçandîbûnê diparêze. Di nava herêmên xwe ango li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de Kurd, Ereb, Suryanî, Asûrî, Turkmen, Ermen, xiristiyan û Çerkezî di nava xwe de digire. Herwiha hemû gel û pêkhate di nava sazî û dazgehên de xwedî rolon û di bin sîstema hevserokatiyê de bi wekhevî cih digirin. Di heman demê de di nava dibistanên xwe de hemû xwendekaran ji netewên cûda digirin û li gorî zimanê wan tên perwerdekirin, ku sê zimanên Fermî li Rojavayê Kurdistanê hene weke Kurdî, Erebî û Suryanî bi hev re wekî zimanên fermî tên bikaranîn.

### Taybetmendiyên Hevpar ên pirçandîbûna Kurdistanê

Cejnên Hevpar: Newroz ji bo hemû gelên Kurdistanê wekî cejna neteweyî û biharê tê pîrozkirin. Di heman demê de, cejnên misilmanan (Remezan û Qurban), yên êzidiyan (Çarşema Sor) û yên xiristiyanan (Akîtu û Noel) li ser asta civakî û fermî rêz lê tê girtin û hemû jî bi hev re pîroz dikin û li cejnên hev amade dibin.

Mûzîk û Xwarin: Li çarparçeyên Kurdistanê gelel netew, pêkhate û gelên cûda hene ku stranên wan yên taybet hene, lê belê ev stran ji aliyê hemûyan ve tên guhdarkirin û hezkirin. Di heman demê de bi pirbûna pêkhateyan re cûreyên xwarinê yên cûda derdikevin û di nava wê civakê de tên belav kirin û hezkirin.

### Gelo piştî serdema kapîtalîzimê û pêşketina zihniyeta nijadperestiyê Pirçandiya Civakî di çi astê de ye?

Piştî serdema kapîtalîzmê û pêşketina nijadperestiyê bi taybet di Rojhilata Navîn de jiyana pirçandî hêdî, hêdî kêm dibe. Di nava civakan de neqebûlkirin derdikeve pêş û li beramberî wê çanda ezeztiyê pêş dikeve. Civaka ku hemû reng û pêkhateyan di nava de digire veguherî cihê cûdahî û nerazîbûnê, ev jî encama pêşketina kapîtalîzim û di heman demê de armancên siyasî yên hin kesan di deverên cîhanê yên cûda ye.

Bi taybet ev yek niha li Sûriyê tê dîtin, Sûriyê bi pirrengiya xwe tê naskirin ku di nava wê de gelek netew, gel û pêkhate digire. Lê Sûriyê veguheriye wargeha şer û nijadperestiyê, ku pêkhate hevdu qebûlnakin ango ji ber tu ji hin pêkhateyêyî tê kuştin. Bi taybet piştî hilweşîna rêjîma baas û hatina hikumeta nû a bi navê hikumeta demkî a Sûriyê ev yek hate dîtin. Kurd, Elewî, Durzî û hwd.. nayên qebûlkirin û hewaldidin ku hebûna wan tune bikin.

Herwiha li kêlekê wê jî hewldidin tecrûbe ango pirçandiya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê salên dirêje têye jiyan kirin hilweşînin û şerê pêkhateyan derxwînin hole, bi her awayî dixwazin nefret û kînan di nava wan pêkhateyan de avabikin, da ku civaka pirçandî hilweşînin û Sûriyê ber bi şereke navxweyî ya dijwar ve bibin û di encamê de armanc û berjewendia hin dewlet, serok û hikumetan pêk were ku hertin sivîl û gel dibin qurbaniya plnên wan.

Bîra Civakê

Rênas Efrîn

## Tacîza zayendî pergala civakan dinûximîne

Yek ji mijarên herî bi tehlûke ku civak bi awayekî domdar pêre rû be rû ne, tacîza cinsî ye, tacîz yek ji diyardeyên neyînî ye ku bandorek mezin li ser kesan û civakan dike. Ew binpêkirinek eşkere ya mafên mirovan û rûmeta kesan e. Tacîz gelek şêweyan digire û di giraniya xwe de diguhere, lê ew sedemek sereke ya gelek pirsgirêkên psîkolojîk, civakî û fîzîkî dimîne ku bandorê li qurbaniyên wê û civakê bi tevahî dike. Li kolanan, li cihên taybet, li qadên civakî û mixabin heta li cihên pîroz ev diyarde derdikevin pêş, sîstem çiqas jê re yasa û zagonan deynin û hewla sînordarkirina wê bikin jî, nikarin bi temamî ji holê rakin, ji ber ku ji pîvanên exlaqî dûr hatiye hiştin û nema kes dikare bi hêsanî kontrolê li ser wê bike, sedema sereke ya ku dihêle ev diyarde were dubarekirin jî ew e ku mirov di aliyê zayendî û îdeolojîk de nehatine têrkirin, lewra jî temamkirina têrkirina îdeolojîk bi van kiryaran tê kirin, ger li holê têgihîştina îdeolojîk a rê nade ku mirov li beramberî nirxê pereyan rûmeta wî /ê jê were standin tune be, encam dawîanîna li jiyana civakî ye. Tacîz reftarên cidî û êrîşkar in ku rûmeta mirovan di şêweyên wê yên cinsî û exlaqî de tehdît dikin. Ew ji çandên toleransê, qanûnên qels, an faktorên psîkolojîk derdikeve. Ew zirarên giran dide qurbaniyan, wek fikar, depresyon û tecrîdê, û bi zêdekirina sûc û bêewlehiyê jî dide civakê. Çareserkirina wê hişmendiya takekesî û civakî, redkirina eşkere ya tacîzê, lêgerîna piştgiriyê, belgekirina bûyeran, û bicîhanîna qanûnên astengkirinê hewce dike. Saziyên perwerdehiyê û malbat jî di perwerde û çandina nirxan de roleke girîng dilîzin. Di heman demê Qelsiya sepandina qanûnê li hin deveran, ku nebûna qanûnên hişk an jî pêkanîna wan a nebaş berdewamiya vê diyardeyê teşwîq dike.

- Binpêkirina mafên bingehîn: Tacîz binpêkirina mafên bingehîn ên mirovan ên ewlehî, azadî û rûmetê pêk tîne.

Çi bi gotin an kiryar be, an jî heta bi binpêkirina azadiya yên din, çi hevalên nêzîk bin an xerîbên li derveyî çembera nasîna me bin. Berevajî vê, em gelek cureyên cûda yên binpêkirina tecawizê dibînin, ya herî berbiçav binpêkirinên cinsî ne, ku bandorê li jiyan û tevgerên mirovan dikin.